


Öcalan bo şoreşa demokrasiyê ya sedsala 21'an gaveke dîrokî:

Manîfestoya Yekîtiyê



■ Doza Sedsalê bi mesajên Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ên dîrokî dest pê kir. Öcalan piştî xweparastina xwe ya bi navê "Manîfestoya Yekîtiya Demokratîk" roja çaran a darizandinê da zanîn ku hege dewlet gavan bavêje ewê pêşniyara darxistina kongreya aştiyê li kurdan bike.

Her wiha Konseya Serokatiyê ya PKK'ê piştgiriya xwe bo Öcalan ragihand û diyar kir ku ewê heta dawiyê bi pêşniyara Serokê xwe Öcalan re bin.

(Doza Sedsalê: R.3)

DI ÇAPEMENIYA CÎHANÊ
DE DOZA SEDSALE:

Jİ BİLİ SER TU RÊBAZ
NAYE PEJIRANDIN

CNN:

Serokê serhildêren kurd Abdullah Öcalan ji hikûmeta tirk şansek ji bo aştiyê xwest ji bo dawî li şerê kurdan ê 15 salan bîne.

Washington Post:

Rojnameya navborî di nûçeyeke xwe de cih daye gotinên Öcalan, ên li ser têkiliyên bi Turgut Özal re, lihevrûniştina rayedarên PKK'ê yên Ewrûpayê bi serhengekî (albay) tirk re û du nameyên Serokwezîrê berê Erbakan ku ji Abdullah Öcalan re şandibû.

AFP:

AFP'ê bi berfirehî cih daye daxuyaniya Konseya Serokatiyê ya PKK'ê. Ajansê ji daxuyaniyê ev rêt dane: "Em dibêjin şerê ku ev 15 sal in didome, bes e. Bi vê baweriyyê em dibêjin di domandina vî şerî de ji bo kesî fêde nîn e. Em hêvî dikin ku bi pêkhatina çareseriya demokratîk, riya aştî û biratiyê vebe."

Al Osba:

"Destê Öcalan ê ku ji bo aştiyê rabûye, dê li hewa bimîne." Di vê nûçeyê de li ser helwesta neyinî ya dewleta tirk û mafêñ kurdan ên çandî û qedexeya li ser zimên jî hatiye rawestandin.

(Doza Sedsalê: R.11)


Prof. Dr. Doğu Ergil, Doza Sedsalê û helwesta Tirkîyeyê nirxand:

Öcalan rîbazeke baş bi kar tîne

■ "Di van 14-15 salan de, ji ber şer, neteweperestiya tîrkan geleki xurt bû û li dora 2.5 milyon kesî li rojhîlatê şer kir. Wekî din dema leşkeriyê, bi tenê dijminatiya PKK'ê nayê kirin, her wiha bi awayekî, dijminatiya gelê kurd jî tê kirin, lewre tu nikarî van kesan ji bo çareseriye razî bikî."

(Hevpeyîn: R.8-9)





E-Mail:s.berbang@usa.net

SAMİ TAN

Têkoşînê, gelê kurd
gihandiye asteke bilind,
lewre jî ew bi dilnizimî
aştiyê dipejirîne. Lê
mixabin heman şerî
civaka tirk xistiye der-
axê gurên birîndar,
lewre jî ew ketine pey
tolhildanê.

D oza Sedsalê roja 31'ê guilanê li Girava Îmraliyê dest pê kir. Di vekirina danişna dadgehê de Serokê Gişî yê PKK'ê Abdullah Öcalan dil kir ku peyamên xwe yên ji bo aşti û yekîtiyê, digel jestek polîtik, pêşkêşî raya gişî ya Tirkiyeyê bike. Lewre jî wî berê xwe da malbata leşker û polîsên ku di şer de hatine kuştin û got: "EZ ês û jana di dilê we de fêm dikim. Ji ber para xwe ya di vê yekê de, ez jî we lêborînê dixwazim."

Serkê PKK'ê bi vê yekê xwest bide ber dilê wan, lê mixabin kesen ku dibêjin, "di xîçikekî vî erdî de em giş bêñ kuştin jî xem nake" ji vê jestê tiştek fêm nekir. Wan kesan dîsa bi awayê klasik nêzîkî di mijarê da: "Ji tîrsa canê xwe wiha kir, lê dîsa jî emê wî bi darve bikin." Piraniya tirkan ci serdest ci jî bindest giş di heman baweriye de ne. Çapemeniya tirk jî wekî berdevkê vê civakê rûpelên xwe bi çêran lewitandin.

Lê Öcalan parêznameya xwe, berî ku derkeve pêşberî dadgehê, dabû parêz-erên xwe û ew parêzname ji hêla parêz-

eran ve li internetê hatiye barkirin. Di vê parêznameyê de dîtin û ramanê Öcalan bi awayekî zelal cih girtiye. Öcalan têkiliya kurd û tirkan, ji roja ku tirk hatine herêmê heta iro, bi awayekî zanistî dinirxîne û dide zanîn ku pêvoya welatpêkanîna kurd û tirkan ketiye navâ hev, ji ber vê yekê ji hev cudakirina wan ne hêsan e. Lewre jî ew, çareseriye di nava sînorê dewleta tirk de, li ser bingeha komareke demokratik pêşniyâr dike. Li gorî Öcalan têkiliyê kurd û tirkan ji bo pergala federal û otonomiyê jî naguncin, ji ber vê yekê ji çareseriye herî guncav, di nava komareke demokratik de nasîna mafêñ demokratik û çandî yên gelê kurd e.

Di parêznameyê de li ser PKK'ê jî tiştên balkêş hatine gotin. Öcalan daye zanîn ku PKK'ê guherîneke berbiçav di civaka kurdan de pêk anîye; bi vê yekê kurd di warê têgilîştinê de gihandine asteke bilind û entegrasyonâ wan a bi komareke demokratik re hêsanîtir kiriye û bi vê kirina xwe jî xizmetekî baş bo komareke demokratik pêk anîye. Di

parêznameyê de hinek xwerexneyî jî ci girtiye. Li gorî Öcalan şerê PKK'ê di sala 1993'yan de gîhîst armansa xwe, pişti wê xwe dubare kir, diviyabû ku PKK'ê ber bi siyasibûnê ve hinek gav bavêtana.

Di parêznameya Öcalan de bi awayekî vekirî sosyalîzm hatiye pesinandin û hêviya ji bo vejîna sosyalîzmeke demokratik û kemîli hatiye zimê.

Her wekî di parêznameyê de jî hatiye gotin, têkoşîna ji bo mafêñ demokratik û azadiyê, gelê kurd gihandiye asteke bilind, lewre jî ew bi hestî tevnagere, bi bilyanî (olgun) aştiyê dipejirîne. Lê mixabin heman şerî civaka tirk xistiye deraxê gurên birîndar, lewre jî ew ketine pey tolhildanê. Civaka tirk ji bo qurbanîyê şerî qirêj li sîcdarekî digeriya, ew 'sûcdar' bi dest xist, niha dixwaze tola xwe jê hilîne. Heta ku ew sûcdarê rastûn nas neke, dê dev jî vê helwesta xwe bernede. Heta ku nas bike jî, dê hîn gelek qurbanîyâ bide. Anglo bi awayê gelê me dibêje "Dê ev hevîr hîn pir avê hilîne."

Divê em Îmraliyê fêm bikin

M. SIRAÇ BİLGİN

T istê ku li Îmraliyê tê darizandin, mafê çarenûsê ê kurdan e. Dewleta tirk jî vê yekê wisa fêm dike, biyanî jî ... Divê em jî vê wisa fêm bikin. 'Serkêse (elebaşı)' serhildana kurdan a dawîn, bi hevkariya NATO-İsrailê hate derdestkirin û teslimî TC'ê hate kiran. Ji wî çaxî de dewleta faşîst, ku ji aliye olîgarşî ve tê birêvebin, pişti amadekariyêne geleki mezin, perdeya li ser xwe hilanî. Berdevkênu ku olîgarşiyê, ku her dem pêşewayê kurd Öcalan wekî 'terorîst' bi nav kiriye, bi awayekî eşkera doza tunekirina Öcalan dîkin. Li hemberî vê yekê, Pêşawayê Kurd, ji mehkemeya qaso, encax ji nav çend heban bi şopandina xeteke stratejîk dikarîbû derketa. Ji van a yekemîn û ya herî kambax; dibû ku bi tîrsa idamkirin jî 'poşmaniyê' behs bikira.. Ya duyemîn; ji bo kesen ku hêviya 'lehen-giyê' jê dikir, bibûya bersiv, bigota ez dadgeha we nas nakim û serî li tiştên eletewş bida. Bi vê riye jî wê Tirkîye bibûya gola xwînê. Lê, wî riya sîyemîn hilbijart: Her çiqas ku darizandinê ne-pejirîne jî nas kir û qerar da ku vê derê wekî platforma aştiyê bi kar bîne. Bi vê riye jî dikarîbû (di rastiyê de TC'ê ev

Serok Apo ji bersivdayîna bo 'malbatên şehîdan' li paş namîne. Ev hevok gelekî balkêş e: "EZ bi qasî tiştê ku li para min dikeve, ji malbatên şehîdan lêborînê dixwazim." Lê di rastiyê de di vê hevokê de felsefeyek gelekî mezin veşarî ye. Wî got, "Ji mirina van mirovan, her du aliye şer jî berpirs in.

kire rewşekê komedyane) di planê 'wesana yekser' biaxiviya, daxwazên xwe ji gelê tirk re bi awayekî baştı vegota û bida zanîn bê ka berpirsê xwîna tê rijandin kî ye û aştiyê kî dixwaze.

Serkê Rûmetê yê KNK'ê Serok Apo, ev stratejiya xwe bi serkeftî pêk anî. Rûniştina wî ya di dozê de, ne wekî tawanbarekî bû; ji êrîşkarî têhîrîan ji gelekî dûr bû. Di rastiyê de, wî fersenda dadgeriyê bi dest xist û ev yek bi awayekî vekirî û gelekî bi hostayî bi kar anî. Em dikarin vê yekê ji van hevokan derxin: "Ku fersend bê dayîn, ez li ser hîmê dewleteke demokratik, ji bo xizmeta aştiyê amade me." Belê ya ku li ser bê rawestandin ev e: "Di bingeha cumhuriyeteke demokratik" de. Serok Apo di ifadeya xwe ya ku wê paşê bê weşandin de, konsepta komara demok-

ratîk jî vedibêje...

Li gorî vê, ev komar, yeke ku gelê kurd û tirk bi hev re wekhev tê de dijîn, bi temamî cumhuriyeteke demokratik e.. Di rastîya xwe de hevok, bi temamî redkirina pergâlê ye. Lê heta tu bêjî bes, hevokeke ku nerm hatiye gotin, heta bêjî bes komareke baş hatiye formûlekîrin.

Serok Apo, di rastiyê de gava li hemberî mehkemeyê komploya navneteweyî anî zimê, mehkeme red kir. Gava ku berpirsê dîlketina xwe rîz dikirin, hevoka wî ya bi rengê "Ligel vê rewşî idamkirina min ne hewce ye", ev ji bêyî ifadekerîna binpêkirina hiqûqa navneteweyî ne tiştek e. Tîne wateya: "Bûyera dîlgirtina korsanî, pêvajoya mehkemeyê li gorî hiqûqa navneteweyî kiriye rewşekê nerewa." Di vir de dix-

waze doza Lîderê Afrîkaya Başûr Ebrahîm, bi bîr bixe ku di wê rejîma nîjadperest de çawa beraat kir.

Serok Apo ji bersivdayîna bo 'malbatên şehîdan', ku ji aliye olîgarsiyê ve bo besdarbûna mehkemeyê hatin ajo-tin, li paş namîne. Ev hevok gelekî balkêş e: "EZ bi qasî tiştê ku li para min dikeve, ji malbatên şehîdan lêborînê dixwazim." Lê niha yên ku vê hevok rast naxwînin, dikarin bêjîn "Wey, Serok lêborîn xwest". Lê di rastiyê de di vê hevokê de felsefeyek gelekî mezin veşarî ye. Vê yekê dibêje: "Ji mirina van mirovan, her du aliye şer jî berpirs in. Ez aliye şer im, lê aliye din jî heye. Hûn di van şert û mercan de, bi hêsanî dikarin bi ser min bîn. Lê tu gôtina we ji bo pergala faşîst ku zarokê we li hemberî me radikin, tune ye. Heta gava hûn berê xwe didin wan, hûn dibêjin, "Zarokê me ji bo we fedâbin"... Ev jî edaleta we ye. Bi rastî yê ku divê bê cezakirin, ewen li jor ên ku zarokê we dixin nav vî şerî bêmaf in. Herin bi berstûka wan bigirin..." Lê wê ev yekîneya tînîn mehkemeyê di pêkanîna van rolêن xwe de berdewam bike. Ew, ewen ku mîjîyê wan hatiye şûştin, wê ji ku zanibin ku têgîna welatê hinekan din di nava xwe de na-hewîne?

Öcalan bo şoreşa demokrasiyê ya sedsala 21'an gaveke dîrokî:

Manîfestoya Yekîtiyê

S erokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan di parêzname xwe ya devkî û niviskî de, bo sedsala 21'an manîfestokeye aştiyê pêşkêşî judgehê kir. Öcalan, di parêznameya niviskî de diyar dike ku, ger Tirkîye fir-endekek bide aştiyê, dê ji bo demokratiyâ sedsala 21'an şoresek pêk were. Her wiha Öcalan diyar kir ku, ew doza eqeñînê nake, ew di komareke demokratik de yekîtiyeye demokratik û biratiya gelan dixwaze. Öcalan got, "Divê ji oşfî û çareseriyê ez bijîm."

Ev daxuyaniyê Öcalan, hem ji aliyê çapemeniya tirk hem jî ji aliyê çapemeniya navneteweyî ve bo raya giştî ya cîmî çewt hate ragihandin. Hate îdiakîn ku Öcalan xwe spartîye dewletê, ji er ku poşman bûye ji malbatên şehîdan lêborîna xwe xwestiye. Her wiha ji mirinê tirsîyaye û ketiye pey rizarkirina canê xwe. Öcalan der barê vê çkê de di roja duyemîn a dadgehê de, zanîn ku wî lêborîn ji dil û can xwestiye û ew neketiye taya canê xwe. Li orî agahiyan Öcalan, di dadgehê de xwe daye rojnamegeran û gotiye: "Cîma hûn naxwazin min fêm bikin, ez li pey qehremaniyeke erzan im."

Li aliyê din di roja sêyemîn a dadgehê de Serokatiya Konseya PKK'ê bi daxuyanike çapemeniyê ragihand ku, wê bi her awayî piştgiriya pêşniyazên aştiyane û demokratik ên serokê xwe Öcalan bike. Di daxuyaniyê de wisa tê otin: "Tevî rexneyên kesen ku ji ber ebûna karîna xwe ya siyasi tu gavan eavêjin û imkanîn mezin bi kar neyîn, daxuyaniyê Serokê me biliyan, erfireh û hûrbîn in." Her wiha Konseya bal kişandiye ser lêborîna Öcalan a malbatên leşkerên tirk û gotiye, "Xwestina lêborînê nîşana mezinahiyê e. Gelê me bêhtir ês û azar kişand. Qet aye gorîn xortenî tîrkan diyar in, lê goke me ya diyar nîn e. Divê raya giştî a Tirkîye yê yekê bizanibe û li gorî a yekê hinekî rîzgîr û hurmetkar be."

Histeriya tîrkan xwe di dadgehê jî nîşan da

Digel hemû rîbazan ne dadyane, dewletê dil heye dozê bi awayî herî hêsan û di zûtîrîn demê de biqedîne. Wekî din dewlet dixwaze bi malbatên leşkeran, bi taybetî yê ku xwe wekî kurd bi nav dikin, tesîrê li derûniya Öcalan bike. Bi baweriya hinek derûdorêne hi-qûqnas Öcalan li hemberî vê hîsteriya ku ketiye heta nav dadgehê, wê nikaribe xwe bi awayekî dadyane biparêze. Wekî diyar e, berî dadgehê, pêşîn Serokomarê Tirkîye Süleyman Demirel,



Konseya Serokatiya PKK'ê piştgiriya xwe ya bo Öcalan diyar kir û bal kişand ser lêborîn. Öcalan a ji malbatên leşkerên tirk û gotiye, "Xwestina lêborînê nîşana mezinahiyê ye."

Peyre jî serokê dadgehê M. Turgut Okçay dabû zanîn ku, wê dadgeh geleki dadyane be. Lî dema mirov li rewşa dadgehê û alên ku bi malbatên şehîdan re ne dînihîre, ev daxuyanî berav dibin.

Di vî warî de Öcalan jî di destpêka dadgehê de, piştî ku ifadeya wî hate hilanîn, berevaniyeke kurt a bi devkî kir. Öcalan, di vê xweparastîne de diyar kir ku, ew dewletên wekî Yewnanîstan, kêm be jî İtalya û Rûsyayê, ji ber ku pêwîstiya qanûnên navneteweyî bi cih ne-anîne, protesto dike. Öcalan da zanîn ku, ji ber vê sedemê ew xweparastin û darizandinê pêwîst û bikêr nabîne. Serokê PKK'ê, di xweparastina duyemîn de jî daxuyand ku Kêşeya Kurd wî neafirandiye, wî ew li Enqereyê li ber xwe dîtiye.

Serokê Giştî yê PKK'ê di xweparastina xwe ya bi sernavê "Di Pêvajoya Çareseriya Demokratik de Qonaxek" de ji bo çareseriya Kêşeya Kurd xal bi xal pêşniyâr û analîzan dike.

Çareseriya Kêşeya Kurd ne vejetin, yekîtiya demokratik e

Divê besê de Öcalan dide zanîn ku, her çiqas rîberî ji aliyê tîrkan ve hatibe kirin jî, kurdan ev yek bi biratî şopandîye. Li gorî Öcalan, dema dewletek bixwaze serbixwe tevbigere, divê xwedîje: "Bo kurdêne Bakur jî Öcalan wiha dibêje: "Bo kurdêne Tirkîye yê cudasîtiyê gi-

Öcalan der barê nûçeyên ne rastîn ên li ser wî de, di roja duyemîn a dadgehê de, daye zanîn ku wî lêborîn ji dil û can xwestiye û ew neketiye taya canê xwe. Li aliyê din di roja sêyemîn a dadgehê de Serokatiya Konseya PKK'ê bi daxuyanike çapemeniyê ragihand ku, ew dê bi her awayî piştgiriya pêşniyazên aştiyane û demokratik ên serokê xwe Öcalan bikin.

rîngtir têne dîtin. Cudatiya zaravayan, rewşa herêmîn ku kurd-tirk di nav hevde ne, bi qasî hejmara kurdêne Bakur li rojava jî kurd hene, békêriya bingeha madî ya teza otonomiyê nîşan dide. Federasyon ji bo bi milyonan kurdêne ku li Stenbol, Edene û İzmirê nagunce. Li gelek cihê dînyayê di şûna çareseriyen herêmî de, bi têgînên ziman û çand çareseriyen demokratik baştır çûne serî."

Divê besê de jî Öcalan li ser çareseriya demokratik radiweste. Öcalan bi kurtasî wiha dibêje: "Nêziktedayina ku li dînyayê rî li ber çareseriyen û pêşketinan vekir, li Tirkîye nehate nîqaşkîrin. Ger ku ji bo çareseriya Kêşeya Kurd pîvanên demokratik bîhata bikaranîn, wê çareseriyen nêzî îdealê pêk bîhatina. Atatürk di daxuyaniyê xwe ya İzmirê de pêwîstiya bikaranîna vê çareseriyen tîne zîmîn. Swîsre cografyayeke di nav hevde ye. Piştî şerîn mezin, ziman, çand û olan çareseriyeye demokratik a hevpar peyda kiriye û niha jî ew li Ewrûpayê xwedîyê demokrasiya herî mezin in. Ger bixwazin, wê hemû bes bi ziman, ol û ernîgariya xwe ya çandî dikarin tevî welatê xwe yê resen yanî wekî Almanya, Fransa û tevî İtalyayê bibin. Lî ew jî dizanîn ku dê bi wê yekê kesyetî û dewlemendiya wan ji destê wan biçe. Li gelek welatê ku cudatiya nîjadî tê kirin jî, em rastî van mînakîn tê. Wekî Belçika, Kanada, Komara Afrîkaya Başûr, Zelandaya Nû û Amerîka jî dizane ku, hevpariya çand, ziman û olan, ji bingeha dewleta demokratik a bîhêz pêk tê. Nêziktedayinê beravajî vê yekê, dê rî li ber şer vekin, wekî ku li Kosovayê tê dîtin."

Bi Protokola Cenevreyê di 1925'an de çekên kîmyewî hatin qedexekirin

Lê hîn kurd kobayênek çekên kîmyewî ne



Hilberandin û bikaranîna çekên kîmyewî û biyolojîk di sala 1925'an de bi Protokola Cenevreyê hate qedexekirin. Lê digel vê yekê jî li gelek deveran ev çek ji hêla hêzén dagirker ve li ser gelên bindest hatin ceribandin. Li Iraqê di sala 1963'yan de kurd bi bombeyênapalmê ji ser xaka xwe tênerkirin û ji-yana kurdan bi bombeyênapalmê yên ku Iraqê bikaranîne ketiye bin xetereyeke pir mezin. Ev çekên ku xwezayê têk dibin, li gorî çavkaniyan ji aliye Almanya, İspanya, Amerika, İngilistan û her çiqas bi awayekî fermî nehatibe îspatkirin jî, ji aliye Sovyetistanê ve hatine hilberandin. Di serî de ev çek li Iraqê dûre li Iranê û ji wê bi şûn de jî li Tirkiyeyê pişti destpêka tevgera Partiya Karkeren Kurdistanê ji aliye artêşatirk ve li diji kurdan hatine bikaranîn. Berî ku em li ser Iran û Tirkiyeyê rastestin, emê der barê çekên kîmyewî û bombeyênapalmê yên ku li Iraqê li diji kurdan hatine bikaranîn, kurte-agahiyeke bidin.

Iraqê Protokola Cenevreyê di 1931'an de mor kir.

Piştî ku Portokola Cenevreyê di 1925'an de tê girêdan, wekî dewletên din yên cîhanê Iraq jî di sala 1931'ê de Protokola Cenevreyê ya qedexekirina çekên kîmyewî dipejirîne. Ligel vê yekê jî dewletên ku ev protokol mor kiriye jî dest ji çekên kîmyewî nekişandiye. Di serî de Iraq û Tirkiyeyê digel Amerika û Israîl ev



kîmyewî tu zanînek ango kapasiteyeke ku têra xebata afirandin, hilberandin an jî bikaranîna çekên kîmyewî bike, tunebûye. Li gorî çavkaniya "The Problems of Chemical & Biological Warfare (Kêsa Şerê Kîmyewî û Biyolojîk)" dema ku Iraq di bin desthilatdariya Brityayê de bûye, di destê hêzén îngiliz de hejmarek çekên kîmyewî û her wiha bombeyênapalmê hebûne. Bi baweriya heman çavkaniyê, dema Brityanya ji Misirê vekişiyaye li dûv xwe gelek çekên kîmyewî hiştine. Li gorî ragihandina heman çavkaniyê heman tişt li Iraqê jî pêk hatiye. Dema ku Brityanya ji Iraqê derketiyê ew çekên kîmyewî yên di destê hêzén wê de ji Iraqê re mane.

Hewlîn Iraqê bo pey-dekirina çekên qedexe

Dema mirov berê xwe bide salên 1950-55'an dê rastiya vê rûdanê baştıribîne. Bi pakta di navbera İngilistan û Iraqê de ku di sala 1955'an de hate imzekirin, hewl û armanca bidestxistina çekên kîmyewî û bombeyênapalmê yên Iraqê baştırek eşkere bûn. Yekemîn car hingî dinya pê hesiya ku Iraq bi pey van çekan de baz dide. Jixwe piştî pakte bi demeke kin Iraqê 6 heb endamên artêşa xwe di sala 1956'an de şandin Amerikayê û ew li ser çekên kîmyewî û biyolojîk perwerde kirin. Wê demê yanî di salên 1951 û 52'yan de ji ber ku Amerikayê di şerê Koreyê de çekên kîmyewî bikaranibûn, ew ji aliye raya gişî ya navxwî ve dihate tawanbar-kirin. Ligel wê yekê jî dîsa endamên leşkerî yên Iraqê di warê marifeta çekên kîmyewî de, ji aliye hezên leşkerî yên Amerikayê ve hatin perwerdekirin.

Çavkaniya îngiliz ya ku li jor navwê hatiye dayin, dîsa dide zanîn ku di salên 1957 û 1965'an de 17 endamên artêşa Iraqê li Amerikayê besdarî kurşen çekên kîmyewî bûne. Ji bo zêdekirina nimûneyan mirov dikare mînaka 1948'î jî bide. Di wê demê de Israîlê jî

li dijî ereban çekên kîmyewî bikar anîne. Li ser vê mijarê Dr. Celadet Çeliker di pirtûka xwe ya bi navê "Lî Kurdistanê û Rojhîlata Navin Çekên Kîmyayı-Biyolojîk û Atomî" de nîrxandinekî dike. Bi baweriya Çeliker, bikaranîna çekên kîmyewî ya Amerîka û Israîlê bala Iraqê kişandiye. Li gorî şiroveya Çeliker, Iraqê dîtiye ku çekên kîmyewî û biyolojîk piştî dijminê herfî qewim tînin erdê û bi saya van çekan serkeftin tîne bidestxistin, lewma Iraqê dest avetiye van çekan.

Kurd bûn hedefa bom-beyênapalmê

Piştî ku di sala 1963'an de Abdulkerîm Qasim bi darbeyekê ji textê Xanedaniya Iraqê tê dûrxistin, Baasiyênu ku li Iraqê tê ser kar, giraniyê didin xebatîn ji bo bidestxistina çekên kîmyewî û bombeyênapalmê. Baasî bo bidestxistina van çekan gelek caran bi îngiliyan re peymanen veşarî girêdidin. Li gorî çavkaniyan di salên 1960-61'ê de Iraqê mîqtarek zêde çekên kîmyewî wekî bombeyênapalmê ji îngilistanê dikire. Dema mirov berê xwe bide şerê di navbera Iraqê û kurdan de, di sala 1963'yan mirov rastî bikaranîna çekên kîmyewî û bombeyênapalmê tê. Wekî nimûne, di meha pûşbera sala 1963'yan de hêzén Iraqê yên di bin fermandariya-Taha Al-Şekerci de li herêma Koysancaqê çardeh gundan bi bombeyênapalmê serobino dîkin.

Li gorî ragihandina belgeya Beşa Agahiyê ya Komîteya Birêvebirana Şoreşa Kurd a sala 1966'an, di wê demê de 50 gund hatine bombekirin û tarûmarkirin. Hînek ji wan gundan ev in: Poyî, Piş, Şan, Soradî, Doskî, Zaxo, Amediye, Yekmala, Birwâvî, Xiş Xaş, Dirgala, Nazaniya, Kox û Hîran. Dîsa di sala 1965'an de jî, li herêmên wekî Bersirîn, Mawliyan, Sirgolû, Gordî û Xomal; di meha gulanê de jî gundan wekî Çoman, Gadala, Vallî, Rezan,

Piştî ku Portokola

Cenevreyê di 1925'an de tê girêdan, wekî dewletên din ên cîhanê Iraq jî di sala 1931'ê de peymanê dipejirîne. Ligel vê yekê dewletên ku ev protokol mor kiriye jî dest ji çekên kîmyewî nekişandiye. Di serî de Iraq û Tirkiyeyê digel Amerîka û Israîl ev çek li hemberî gelên 'hindikahî' bikar anîne.

Panven, Mîrga, Hilşû û diza bi van çekan tîn rûxandin. Di meha tîrmehê de jî li herêma Hewlîr gundan bi navê Moran û Hemzebeg ji aliye hêzén Iraqî ve bi bombeyênapalmê hatine şewitandin. Li gorî çavkaniyê cur bi cur yekem car Amerikayê di sala 1961'ê de bombeyênapalmê di şerê Wietnamde li dijî şervanên tevgera rizgarîxwaz a gelê Wietnamê Wietkongan bi kar anîne. Her çiqas ev agahî di hînek roj-name û raporêne fermî de hatibin weşandin jî, heta niha bi awayekî fermî ev agahî ji aliye qanûnên navneteweyî ve nehatine çespandin.

Ligel wê yekê di nav tu belgeyên resmî de nehatiye diyarkirin ku Iraqê çekên kîmyewî ji ku derê bi ci awayî bi dest xistine. Lê li gorî çend çavkaniyê Amerîkî û îngilîzî, Iraqê çekên kîmyewî bi saya hînek şirketên navneteweyî bi dest xistine. Tê gotin ku hingî Iraqê febrîqeyen ku bombeyênapalmê hil-diberandin ava kirine. Dema mirov li têkîliyên Iraqê yên dewletên wekî İngilistan, Amerîka û Rûsyâ û dewletên rojhîlat mîze bike wê gelek tiştîn ne zelal eşkere bibin. Yek ji wan dewletan Sovyetistane. Wekî mînak, her çiqas wê demê bi destê Baasiyan bi hezaran kurdên komûnîst û yên Iraqî hatibin qetikirin jî, têkîliya Sovyetistane bi Iraqê re ne di radeyeke nizim de bûye. Belê demekê Sovyetistane bo Kêşeya Kurd her çiqas li dijî Iraqê derketibe jî û xwestibe bi riya Moxolîstanê pirsgirêka kurd bixe rojeva Neteweyen Yekbûyî jî, di sala 1964'an de têkîliyên di navbera Iraq û Sovyetistane de ji berê xurtir bûne. Wekî mînak dema ku Serokomarê Iraqê Abdulselam Arif di sala 1966'an de di qezeya firokeyekê de dimire, birayê wî Abdurrahman Arif ji bo çek kirînê li Moskovayê bûye.

(Dê bidome)

Navê meh û demsalan bi kelhûrî

RÊBIWAR FATAH

Dema mirov bala xwe dide navê mehan ên di kurdî de, hê di serî de têkiliya an a rasterê bi awayê jiyanê ya elê kurd ê berê û niha diyarî çan dibe. Kelhûrî jêrzaravayekî surmanciya Başûr e. Kesên ku bi zaravayî dipeyivin bi piranî li erêma Kırmaşan dijîn ku ew jî di in destê Iranê de ye. Her wekî ji avêne mehan jî diyar e, jiyana elê kurd bi xurtî girêdayî çandî û cotoyariyê ye. Hilberîneriya van bi xurtî di bin bandora bû-erên xwezayî de dimîne, lewre jî li navê mehan de bandora bû-erên surîstî balê dikişine. Tevî u di soranî de ji bo her mehê bi enê navek heye, di kelhûrî de hi-ek mehan du navê wan hene ku u taybetiyê cuda yên wê dema alê nîşan didin.

Wehar-behar-

Mehê werza biharê

✓ Meha yekemîn a biharê:

Newrîzmang: Meha yekemîn a sala kurdî û meha yekemîn a biharê. Ev peyv ji sê hêmanan pêk ê: new-roz-mang. Her wekî tê zanîn new nû ye, roz e û mang jî

meh (heyv) e.

Darçeqîne: ji şaxvedana daran tê. Çeqîn di kelhûrî de şaxvedan e. Ew jî navê duyemîn ê meha newrizmang e û wê mehê navê xwe ji şaxvedana daran wergirtîye.

✓ Meha duyemîn a biharê:

Giyabarîk: ev nav jî navekî hevedudanî ye û ji du hêmanan giya û barîk pêk tê. Wateya "barîk" di kurmancî de "tenik" e.

Giyagenan: ev peyv jî ji du peyvîn serbixwe pêk hatiye: giya û genan (çinîn).

✓ Meha sêyemîn a biharê:

Gulezerd: ev meh jî navê xwe ji zerbûna gulan werdigire.

Codirew jî navê duyemîn ê vê mehê ye û ew jî disa ji bûyereke çandinî angó ji dirûtina ceh navê xwe digire.

Tawsan (havîn) – mehê havînê

✓ Meha yekemîn a havînê:

Kewkir: meha hêkdanîna kewan e. Firindeyê bi nav û deng ê ku wekî semboleke neteweyî ya kurdan tê zanîn, di vê mehê de hêkan dike û li hêlinâ xwe datîne.

✓ Meha duyemîn a havînê:

Gaqûr: di vê meha germ a havînê de, ga ji bo ku hev û din ji

tirêjîn rojê biparêzin li nik hev dibin qor ango rêz dibin. Jixwe navê mehê jî ji vê yekê tê.

✓ Meha sêyemîn a havînê:

Şertşuwân: soza şivanan. Di vê dema salê de şivan soz didin ku ji bo çêrandina pêz ji xwe re cihekî taybet diyar bikin.

Gertgertxerman: ev meha dirûtinê ango rakirina bênderan e. Jixwe peyva gertgert tê wateya dirûtinê û xerman jî bênder e.

Payiz-mehê payizê

✓ Meha yekemîn a payizê

Wahêlan:

Êlkenan: êl ji zozanan vêdigerin cihêngerm.

✓ Meha duyemîn a payizê

Winewişt-kew:**Wilingerêzan:**

✓ Meha sêyemîn a payizê

Serdewa: meha dawîn a payizê ye. Ji serd (sar) û wa (ba) tê. Rojê sar ên zivistanê dest pê dîkin û bayekî sar tê.

Zistan/zimistan– mehê zivistanê

✓ Meha yekemîn a zivistanê

Hisawat: ev navê meha yekemîn a zivistanê ye. Di vê mehê de hemû rê ji ber berfê asê dibin û

hin caran cîran jî nikarin biçin serdana hev û din. Di vê demê de gundî û eşîr hesabê pêdiviyêne xwe yên zivistanê digirin.

✓ Meha duyemîn a zivistanê:

Mang siye: navê vê mehê jî ji du peyvan mang (meh) û siye (res) pêk tê. Ev meh tarîtirin meh e. Hin caran jî ber mercen giran ên zivistanê, qût û berên mirovan heder dibin. Hin caran jî mirov ji yana xwe ji dest didin.

✓ Meha sêyemîn a zivistanê:

Kîsetekin: meha dawîn a zivistanê û meha dawîn a salê ye. Ev jî ji du peyvan; kîs û tekin (vala) pêk hatiye. Di vê mehê de tûrê xwarinê hêdî hêdî vala dibe.

Giyaxêzan: giya ji nû ve şîn tê. Peyvîn giya û xêzan (mezinbûn) ku digihêne hev û navê vê mehê pêk tînin jî vê yekê nîşan didin.

Têbinî: Ji bo xebateke berfi-rehtir binérin: Ferhad Azîzî: "Wext û zeman: base lesor rojsr", sirwa, Nawenda bilawkir-dinewey Ferheng û Edebî Kurdî, Wirme-Iran, hejmar 141, Xaklewe 1998, rp:51-57

WERGER JI İNGİLİZİ:
SAMÎ BERBANG

Sinet û dabûnêrît

DR. HUSEYNÊ XELIQÎ

B eşî zorî nawçey rojhelatî Kurdistan behsî sinet ber guhê newketiwe. Meger lem diwayane de dina şûnewarî sinetî nuwe be xoye nedîtiwe. Le derwey Şah da, gişt cadekanî xakî bûn, le ber ewe beşekî zorî xelkekey koçber bûn, kêmîr qutabxane le wê damezrabû. Zorbeyî zorî xelkekey ne xwêndewar bûn. Esta besî zorî xelkî nawçey be taybet minalekan xwêndewar ïn û le ber şûnewarî şerî Iran û Iraq û wêrânburû, newed le sedî xelkî şar û şaroçke û gundekan ke le seretayî şerewe zorbeyan be hoyî Iraqewe dagîr kirabûn, ziyatir rûyankirduwate bajaregewretkan. Le akamî em şere da, şûnewarî ew alivcar û nawçekoçeriyanê jî nemawin û xelke lêqewmaweke deretaniyan niye kelkî lê werbigirin. Maweyeke

beş lew xelke malkawilkirawê, bere bere degerênewe bo şîwêñî baw-bapîraniyan. Pêwendî nêwan xelkî em nawçeberîney Kurdistan legel xelkî başûrî Kurdistan be hoyî têki-lawî zorî jin û jinxwazî û hawregezî, yekcar baş e û hatûcûyan germ e.

Lêre da pêwendî eşîrteyî be hêz e.

Zor caran be hoyî sîtemî desthilatî nawendî le xelkî nawçey legel hukmet tûşî kêşe bûn. Le akamî zorbeyî desthilat da hendek lew xelkan le dewlet yaxî bûn û amade nebûn mil be petî stime da bikeyn. Akamî em rewte perestandinî diyardeyî dizêwî çetegerî û rawut le nawçey da buwe. Lew pêwendîye da, jinekaniyan wek piyawan şerî meydanî berberekanî û le katî tengane da dij be neyaranî xoyan çek ser şan le gel piyawekan dêne meydan.


Erkî zorbeyî bar û koçî koçerekânî nawçey, le ser şanî jinan e. Jinan be cil û bergî kurdî û serûserwêñ û silkeyî û hewrî dabî nawçewe, erkî serşaniyan enda dide. Lew nêwan em xelke da pêwendî binemaleyî yekcar be hêz e û eger biçine

xwezbîniya keçek û piyan neden, lew nêwaniyan da şer û kêşe saz debê.

Carî wayîş çek dête meydan û be zor kîj derfînen. Bem core lew biware da piyawekaniyan le piyawekanî nawçeyî Kırmaşan, le şer û şor û yaxîbûn da biwêrtir ïn. Emeş berhemî mandigarî xoxedeyî eşîreyî le ew nawçey da ye.

Ta em diwayiyane kiçan mañî helbijartînî hewseriyan nebû. Be pêcewaneyî nawçekanî dîkeyî Kurdistan ziyatir xalo, xawin desthelat e û kiç be mîr dida. Ewîş berhemî paşmaweyî sistemî dayiksalarî ye.

Xelkî nawçey le ber zortirkirdinî xizim, ziyatir xwazîrî marekirdinî kiçan le bêgane. Çimkî pêyan wa ye xizim her xizim e. Ejîn, "Be sikpiş bigire". Em nawçeye be nehêñî û aşkira karî siyasî têda nekirabû. Her bo ye be remakî kurd bûn û hestî kurdayetiyan hebûwe û ta em duwayena kemtir bahsî kurdayetiye şeweyî nuwe û berguhêyan kewtiye.



Avakarê pira gelan:


Erdoğan Özdemir

Dema termê gerîlayan li Antalyayê ji gorê hatin derxistin, civaka Tirkiyeyê li ser kûçikekî hêstir dibarand. Li aliyê din diyar bû ku, sebra rayedarên Tirkiyeyê êdî bi "kurdê mirî" ji nayê, lewre berê wan bi tenê digot: "Kurdê herî baş kurdê mirî ye." Erdogan Özdemir yek ji van "kurdên baş" e, ku cenazeyê wî bi kepçeyan ji gorê hate derxistin. Lî ew ji bo avakirina "pira gelan" çûbûn mîvandariyê...

Erdogan Özdemir (Taylan-Rodi), di sala 1973'yan li navçeya Doğanşehir a bi ser Meletiyê ve ji dayik bûye. Pişti ku ew li bajarê Tirkiyeyê İzmîtê dibistana seretayî kuta (xillas) dike, malbata wî dîsa vedigere Doğanşehirê. Taylan, dibistana navîn û lîseyê li vê derê bi serî dike, paşê ji bi awayekî serketî, li Amedê li Zanîngeha Dicleyê beşa kargeriyê (isletme) dixwîne.

Taylan, di dema zarokatiya xwe de gelekî jîr û zane bûye. Ew, vê demê bi xwişk û birayên xwe ve çûye ser karê raçandina (dokuma) xelîçeyan, da ku arîkariya malbata xwe bike. Ew, dema lîseyê têkoşîna neteweyî nas dike; ev tesîreke mezin li wî dike, lewma ew di tevger û kesayetiya xwe de guherîneke mezin pêk tîne. Li pey vê demê, sosyalîzm bêhtir bala wî dikşîne, lewma ji bo fêmkirina vê ideolojiyê bi şev û roj pir-tûkan dixwîne. Bi baweriya wî, doza rizgariya neteweya kurd, bi tenê dê bi sosyalîzmê biçûya serî.

Li aliyê din, kirin û gotinê wî jî li hev bûne, lewre sosyalîstiya wî tenê li ser zimîn nemaye. Ew, bi her awayî li dîjî malê arîzî (özel mülkiyet) bûye. Dema li baxçeya xwe yê mişmişan xebitiye, ji bavê xwe re gotiye "bixebite bavo bixebite! Em dê siberoj vê xaka pîroz li hemû gelê kurd belav bikin." Her çiqas Taylan zêde xizanî û belengazî nedîtibûye jî, wî her tim bala xwe daye xizaniya gelê kurd û ev yek ji dilücan hîs kiriye.



Wêne: Özgür Halk (hejmar: 99)

Wekî din, ji ber ku herêma ku ew jê bû, gelekî asîmîle bûbû, Taylan girîngîyeke mezin didayê û wiha digot: "Pêwîst e li vê herêmê rêxistina ciwanan bê avakirin û di vî warî de, divê xebatê şoreşgerî bê xurtkirin." Ji ber vê xebatê wî ya li ser ciwanan, gelek kesen ku bi riya Taylan têkoşîn nas kiriye, xwe digînîn refen gerîla.

Ji Kurdistanê heyâ Behra Spî

Taylan pişti ku lîseyê diqedîne, dest bi amadekariya bo zanîngehê dike. Lewre daxwaza wî ya herî mezin çûyina paytexta Kurdistanê bûye, da ku bikaribe gel û welatê xwe çêtîr nas bike. Taylan, pişti ku zanîngehê bi serî dike, di sala 1994'an de tevî refen gerîla dibe. Ji bo ku, ew di demeke kurt de, tevî warê teorîk di warê leşkerî de jî xwe bi pêş ve di be, berpirsiyeke komekê hildide. Koma ku Taylan tê de ye, çar salan li Kurdistanê dimîne, paşê li ser ferманa Partyê, kom derbasî Herêma Derya Spî dibe.

Erdogan Özdemir, 1994'an de xwe digîhîne refen gerîla. Berî vê, ew li Amedê li zanîngehê dixwîne, da ku gel û welatê xwe baş nas bike. Pişti ku çar salan li welât dimîne, koma ev tê de ye, bi peyafî, di nava 6 mehan de derbasî Behra Spî dibe. Ew, roja 27'ê gulanê sala 1998'an şehîd dikeve.

yan ew li hêviya çûyina karkeran dimînin.

Dewlet termê wan ji nade

Li aliyê din, di wê navberê de leşker jî gelekî zêde dibin û her operasyonan li dar dixin. Roja 27'ê gulanê sala 1998'an Taylan û du hevalên wî li kemîna dijmîn diqelibin; di dawiya şerekî dijwar de, ew û du hevalên wî digîhîjin refen pakrawanan. Pişti şer, leşker termê Taylan û du gerîlayê din li pey qantiran girêdi din û heya navçeya Antalyayê Serikê kaş dîkin. Lewre termê wan nayê naskîrin.

Li pey şehadeta Taylan, malbata wî bo standina cenazeyê wî serî li Dozgeriya Serikê dide, lê dozger dibêje wan, "Hûn çîma hatine vê derê..." Bavê Taylan dibêje, "Em hatin cenazeyê kure xwe hilînîn." Li ser vê yekê dozger bêhemdî xwe dibêje "Belê, wî kurê we yê terorîst 20-30 mehmetçîkî me şehîd...", lê gotina xwe nîvco dihêle. Pasê bavê Taylan hildikişê cem waliyê Antalyayê. Ji vir wî dişînin emniyetê. Li vê derê neheqî û tadeyeke mezin li wan dîkin û dibêjinê "Em nîzanîn kurê we li ku derê ye." Peyre jî wî dişînin cem fermardiyâ leşkerî. Fermandar jî di ser bavê Taylan de diqfre û dibêje, "Ew ne terorîst e! Ew şehîd me ye û pê serbilind û serfiraz in..."

Li pey vê yekê malbata Taylan serî li dadgehan dide, da ku cenazeyê wî bistîne, lê ev salekê mehkeme didome. Ger mahkeme li Tirkiyeyê encamekî nede wê malbata wî serî li Dadgeha Mafen Mirovan a Ewrûpayê bide.

Ev helbest ji aliyê Erdogan Özdemir ve ji bo "dayikênu bo şerê azadiyê la-wikan dişînin" hatîye nivîsin. Me beşek bo kurdî wergerand û em diweşîn:

...
heye ku rojekê
laşê min biavêjin gastîna gund
hem jî qulqlî û bêpoz û çav
lê rûyê xwe jê bade
li çiyan, stérk û rojê binihêre...

...
Zebaniya nîvê şevê li deriyê te daye
pirsa min kiriye
bêje wan bila hay jê hebin
Nûrheq e heta hetayê cih û warê min
Nema tenê diherikin
kaniyê me yén li zozanê terikandî...
Taylan Rodî

Li NÇM'ya ïzmîr
● 05.06.1999 şemî

Konferans: Çand û Politika

Beşdar: Müslüm Yücel

saet: 17:00

● 06.06.1999 yekşem

Gotübêj: "Çirok û Dîroksifra Nemerdan"

Beşdar: Apê Husêن, saet: 17:00

ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



Li BEKSAV'8

● 05.06.1999 şemî

Suna Aras, Ayşe Yılmaz û Av. Filiz Kalayci çavdêriyên xwe yên 3'ye mîn delegasyona Kokcivîna Filipinler a di bin çavan de windayan, tîmin zîmar, saet: 18:30

● 06.06.1999 yekşem

Bîranîna Hazım Hikmet, Orhan Kemal û Ahmed Arif

Amadekar: Mustafa Köz, saet: 17:00

Weşanên kurdî di internetê de ne

Piştî Serxwebûnê Welat jî bergeha xwe fireh kir

Xwendevanen kurd êdî dikarin weşanen li ser rewşa kurdan ku heta iro nedikaribûn bi dest bixin, bi rehetî di internetê de dest bixin û bixwînin.

Heta iro weşandina pirtûk, kovar û nûçeyen ku ser kurdan bûn, ji aliyê serdestan ve dihat qede-kirin. Lî êdî ji vir û wê de nikarin pêşî li wan girin. Yek ji van kovarê qedexekirî, Kovara sisî ya mehane Serxwebûn, ku li Ewrûpâyê derkeve û ev 18 sal in weşana xwe berdewam di, ji despêkê ve li Kurdistan û Tirkiyeyê qede-ye û xwendevanen li van deran jîn nikarin bi awayekî het û vekirî

de li benda xwendevanen xwe ne. Kovara Serxwebûn di vê navnîşanê de cih digire: www.serxwebun.com. Navê çend pirtükên ku xwendevan dikarin bi vê riyê xwe bigîhînin, wan ev in: Abdullah Öcalan, "Nasıl Yaşamalı III" (Mirov Divê Çawa bijî I-II)", "Devrimin Dili ve Eylemi (Çalakî û Zimanê Şoreşê)", "İlk Konuşmalar (Axavtinê Pêşîn)", "Romana Belgeyi ya HÜ -



seyîn

Özbey", "Tarihe

Görmülümsü Zamanların Peşin-deki Militan (Militan'a li Pey Demen Dîrokê de Nok Bûne)", "Mordem'in Güncesi (Rojnîva Mordem)", ya Muzaffer Ayata, "Tarihe Ateşten Bir Sayfa: Diyarbakır Zindanı (Bo Dîrokê Rûpeleke ji Eğir: Zindana Amede)".

Edî OHAL jî nikare pêşîya A. Welat bigire

Rojnameya Azadiya Welat di çarsaliya xwe de zincirên qedexeya OHAL'ê bi vekirina sîteya internetê parce kir. Wekî tê zanîn sala par di meha kewçêre de ketina Azadiya Welat bo OHAL'ê hate qedexekirin. Ji wê rojê û heta iro xwendevanen me yên di nav sînorê OHAL'ê de dijîn, nedikaribûn rojnameya xwe ya ku bi zimanê da-yika wan tê weşandin, bi hêsanî bixwînin. Lî êdî bi vekirina sîteya internetê, xwendevan dikarin rojnameya xwe ya bi kurdi bixwînin. Navnîşana

SERXWEBUN
Ji Serxwebun û Azadiyê bi nûmottir tiştek nine

xwe bigîhî-

nin vê weşanê.

Her wiha Rojnameya Azadiya

Welat jî, tekane rojnameya hefteyî ya kurdî ye, kurd û Kurdistaniyê li ser axa xwe dijîn, (bi yebîtî yên li bakurê welêt) nikaribûn li ser axa we, bi hêsanî vê rojnameyê bixwînin.

Lî êdî bi pêşketina teknolojiyê re dinya biçük, sînorê qedexekirinê hatin rakirin. Bi derketî a internetê re jî sînorê qedexekirî ji ji holê han-rakirin. Kurd jî ketin internetê û sînorê qedexekirinê parce kirin. İro xwendevan bi hêsanî dirin xwe bigîhînin kovara Serxwebûn, rojnameya Azadiya Welat, Özgür Politika û wd.

WELAT.com

info@welat.com

Arşiv


Malpera Azadiya Welat jî ev e: www.welat.com

Her wiha ji bêyî Kovara mehane ya siyasi Serxwebûn û rojnameya hefteyî A. Welat, kovar û rojnameyên ku li derveyî welêt têne weşandin wekî Dugir, Armanc, Rojbaş û wekî Özgür Politika û The Kurdistan Observer jî di internetê de ne.

Ligel van gewimîn û pêşketinê dîrokî, Doza Sedsalê jî ev demek e ketiye internetê û bi vê riyê, raya gişî ya cîhanê ji qewimînê der heqê doza Serokê Gişî yê PKK'ê Abdullah Öcalan de agahdar dike. Malpera Doza Sedsalê, girêdayî qewimînan berdewam xwe nû dike: www.asrinhu-kuk.com

SERWISA ÇANDE

ÇAVDÊRÎ



"Apo Can"

MİRHEM YİĞİT

Duh, roja 31'ê meha gulanê, em kurd li Meydana Sergelstogê li paytextê Swêd Stokholmê, cardin ji bo Serok Apo hatin ba hev, me cardin bi hev re çend saet derbas kirin.

Jixwe ev meydan maye li ser hesabê me. Hefte û meha ku em carekê, çend caran li wir necivin, ji wir ber bi balyozxaneyekê ve nekevin rê, yan jî ji cihékî din neyên wir û çalakiyekê li dar nexin, bêje hema nemaye. Gelek caran dost û nasen me bi henekî be jî dibéjin: "Belediyeya Stokholmê ji neheqî navê vê meydanê nake meydana kurdan, ma kî bi qasî kurdan tê vir?"

Di demen çalakiyan de axavtin têne kirin, stran têne stirin, helbest têne xwendin û ji her aliyî û her perçeyî kurd dikevir nav govendê. Meydana Sergelstogê dibe cihê protestokirina nerewayî û bêbaviyên dagirkeran. Li vir lanet li kirinên zordaran têne barandin, hovîti û kirinên wan têne protestokirin û ji vir kurd diqîrin, raya gişî hisyar dikan û dengê xwe digîhînin cîhanê.

Li Swêd û li seranserê Skandînavyayê kurdên ku ne carekê, çend caran, nehatibe Sergelstogê gelekî kêm e. Ev der ne bi tenê bûye mewzî û trîbûneke riswakirina neyaran, belê ji bo yekîtî û hevgirtina kurdan jî bûye wargeh.

Berdewam, tişte ku bi aliyekî xwe cihê ye, di meş û xwepêşandanen berêtir de nebûye, di bala mirov de dimîne û dibe rengekî taze; suprizeke bitam, pêde dibe.

Supriza vê carê, mamosteyekî muzîkê ji bajarê îlamê bû.

Mamoste bi xwe kurdê kelhûr e û bi mêvandarî hatiye Swêdê. Hê meha wî li vî welatê nû neqediyaye. Li gorî ku piş re ji me re hate gotin, di dema prosesê Romayê û girtina Serok de ew hê li Rojhilatê Kurdistanê bû û raperîn û serhildana gelê kurd ji nêzîk ve şopandibû. Wî jî bi deh hezaran kurdên din re li Rojhilat bang kiribû: "Başûr Bakûr Rojhilat, Apo Serokê Welat". Di nav vê atmosfera germ, neteweyî û Kurdistanâ de; mamoste li ser Serok helbestek nîvîsiye û kiriye stran. Navê helbesta wî "Apo Can" e. Mamosteyê mîvan, duh ji kurdên li Meydana Sergelstogê re ev helbest bi muzîk û gotinên xwe xwend. Kêfa xelkê gelekî ji vê helbestê re hat.

Şoreşa neteweyî fireh dibe. Serokatiya Apo dibe malê hemû kurdan. Ji her aliyê Kurdistanê, li ser serok helbest têne nîvîsandin û stran têne gotin. Ev jî ne bi têne bi zaravayekî û duduwan, belê bi giş zarava û devokan. Neteweyîbûneke heralî li dar e. Serokayetî neteweyî dibe, çekdar û şervan neteweyî dibin, civîn, şev, xweşî-nansekirin û bi kurtî jiyan giş neteweyî dibin.

Berî niha bi çend rojan, Kongreya Neteweyî hate ragîhandin. Serok mîna serokê fexî hate hilbijartin ji bo Kongreve. Ev tacegul û zîrweya neteweyîbûnê ye.

Prof. Dr. Doğu Ergil Doza Sedsalê û helwesta Tirkiyeyê nîrxand:

Öcalan rîbazeke baş bi kar tîme

Prof. Doğu Ergil, cara yekemîn bi rapora ku li ser navê TOBB (Yekîtiya Ode û Borsayê Tirkiyeyê) amade kiribû, "Rapora Rojhîlatê" kete rojeva raya giştî. Peyre bi pêşengiya wî, hin derdorêñ tirk û kurd bi navê TOSAV (Weqfa Lékolîna Kêseyên Civakî) weqfek ava kir. Weqfê berî niha bi çendekê, ji bo çareseriya Kêseyâ Kurd bi navê "Belgenameya Hevpar a Lihevhatinê: "Ji bo Demokratikbûna Tirkiyeyê û Çareseriya Kêseyâ Kurd Pêşniyareke Pergaleke Nû ya Destûrnameyi" (Ortak Anlayış Belgesi 'Türkiye'nin Demokratikleşmesi ve Kürt Sorunun Çözümü İçin Yeni Bir Anayasal Düzen Teklifi). DGM ji bo vê xebatê bîryara berhevkinî da û li dijî wê, doz vekir. Me li ser vê belgenamayê, helwesta rayedarêñ Tirkîye û Doza Sedsalê bi Doğu Ergil re hevpeyvînek pêk anî.

Her çend Ergil xwe wekî aliyê "qasîd û objektif" dide xuyakirin jî, lê şewaz û nîrxandinêñ wî vê yekê destnîşan nakin. Bo nimûne; ew navê Öcalan hilnade û dibêje "ev zilam, vî zilamî". Her wiha dibêje "Kesên kû ji bo aştiyê bixebitin, divê ne PKK'yî bin. divê kesen ku kurd hurmet û rezê jê re digerin, bin." Em bawer in Ergil bi çavê serê xwe dît, pişti girtina Öcalan gelê kurd çawa li çar aliyen cihane rabû ser piyan. Dîsa, her çend heya niha tu malbatê gerîlayan doza ser nekiribin jî, ew dibêje "Malbaten li her aliyan doza tolhildanê dîkin." Tişte herî girîng, ji bo dewletê bikaranîna şîdetê maf û rewa dibîne, li aliyê din dibêje "Divê PKK gavê berbiçav biavêje." Agirbesten ku heta iro hatine îlankirin, ma ne gavê berbiçav in?

Hûn dikarin serpêhatiya vê xebatê bi kurtî vebêjin?

→ Ji bo ku em çareseriyeke bê şîdet peyda bikin, me ev xebat pêk anî. Bi besdariya hemû birêñ (kesim) civakê, me civînek li Ewrûpayê û du jî li Tirkiyeyê li dar xistin. Dawiya dawî, pişti xebata sê salan ev belgename derkete holê. Me di vê belgeye de, rîgezêñ (prensip) ku kurd û tirk dikarin li ser li hev bikin, dane xuyakirin.

Digel ku hûn doza aştiyê dîkin, ji bo belgenameya we bîryara berhevkinî hate ragihandin; hem jî pişti da xuyaniyêñ Serokê Dadgeha Qanûna Bingehîn Ahmet Sezer. Gelo raya giştî, ji bo pejirandina vê belgenamayê çi-qas amade ye?

→ Ev yek, girêdayî şewaz û awayê doza demokrasiye ye. Ger ez bibêjim, tişte girîng mafen demokratik û mirovanêne, lê yê li hember bibêje "Na. Ez doza mafen kurdan dikim." Na, birayê min! Edî bi navê mafen kurdan tiştek nemaye. Ger di warê mafen mirovan de serastiye peyda bibe, dê kurd, çerkez, laz û arnawût jî tê de cihê xwe bigirin. Lê tu bibêjî "Na. Me gelekî dijwarî û zehmetî dît, lewma divê aliyê kurdan hebe." Niha, doza demokrasi û aştiyê tê kirin, li hêla din têkoşîna çekdarî li dar e. Lewra hin hinctet û sedemên vê yekê hene. Dewlet xwedan wê maf û rewayetiyê (meşrûiyet) ye ku her tim şîdetê bi kar bîne. Aliyê din jî dide ser dijwariyê (şîdetê). Dewlet, wê her tim vê yekê wekî hinctet û sedem bide pêş, wê bibêje "Li hemberî min komeke çekdarî heye."

Puxteya gotinê; di demokrasiye de, yên ku doza mafen xwe dîkin, gelo ci-

niya xebatê çûbû serî. Peyre di navbera sala 1997-1998'an de jî civîn û gotûbêj hatin lidarxistin. Di vê pêvajoyê de hin tişten nû lê hatin kîrin û cardin hate sazkirin. Me ev belgename ji bo gelek derdorêñ têkildar şand. Lê PKK bi vê yekê ne kîfxweş e û dibêje "Nûnerê kurdan ez im."

Pişti ku Öcalan hate girtin çapemeniya Tirkiyeyê got: "Koka PKK'ê qeliya!" Hûn vê yekê çawa dinirxînin?

→ Çapemeniya tirk, tişten ku jê re tene gotin dinivise, lewre divê mirovguh nede çapemeniya tirk. Binêrin! Ez ji hemû rojname û televizyonan hatim vederkirin. Bi fermanan ev dek û dolab birin serî. Niha jî, bi doz û dadgehî min çavtirsandi dîkin. Lê divê ev jî bê zanîn; ev belgename li ber desten hemû hikûmetan heye. Lewre gava Tirkîye bibêje "Ji bo ku em bibin weliteke rojavayî û ewrûpî, em her tişti dîkin," em jî dê bibêjin "Ha ji te re belgename!" Ji

xebat ji bo ci pêk anî? Ji bo ku em hes-ta lêqewimîn (mağdur) û vederbûnê (dişlanma) a kurdan ji holê rakin. Her wiha ji bo ku em hêvî û daxwazên kur-dan hîn bibin, peyre bidin ber hêvî û daxwazên tirk, me ev xebat kir. Me pîrikatiya (ebelik) vî karî kir. Ger xalîn vê xebatê bêne pêkanîn, wê aramî û hêmîneyeke mezin pêk were. Lî şertîn vê yekê hene. Divê PKK bi awayekâzelal bibêje "Ez van şertan qebûl dikim û li ser vê bingehê ji bo çareseriye amade me." Ger PKK wisa bike, wê li Tirkîye û li cîhanê jî hikûmet, kes û saziyên demokratik piştgiriya xwe diyar bikin. Di vî warî de ez helwest û nîrînên geleki erêni û pozitif distinim. Wekî min got, ev belgename li her derê cîhanê hate belavkirin. Gelek kesen rojavayî gotin min "Ev xabeteke geleki baş e, lewre ne şoreşger e muhafazakar e. Her wiha ev proje li pîvan û daxwazên rojavayê jî tê." Heke tevgera kurd jî xwe bide ber vê yekê, ku hikûmeteke neteweperest jî desthilatdar be, wê guherînên demokratik pêk werin.

Hûn jî di nav de, gelek kes li dijî têkoşîna çekdarî ye. Lî wekî we jî da-ye zanîn "hebûna kurdan, pişti xwîn riyyîa hate qebûlkirin."

→ Mixabin wisa ye; em qebûl bikin an nekin jî hebûna kurdan bi vî awayî hate dîtin. Lê divê PKK edî dest ji şîdetê berde. Hêzên ewlekariye yên tirk jî dixwazin PKK şîdetê bi kar bîne, naxwazin PKK bibe tevgereke siyasi. Lewre artes xwedan wê hêzê ye ku, bêhtir bide ser şîdetê. Her wiha artes bi vî awayî zêdetir piştgiriya civakê digire. Encama hilbijartinan xuya ye. Ecevît jixwe neteweperest e. Ev tê ci wateyê? Ne PKK, divê gelê kurd wekî muhatap bê dîtin.

Jixwe PKK'ê ev yek anî ser zimên û got "Beyî me jî Tirkîye dikare bi gelê kurd re meseleyê çareser bike."

→ Rast e, ev yek anî ser zimên. Lê kirin û gotin li hev nakin.

Li aliyê din di belgeye de tê xuyakirin ku "heke şîdet bûye awayî diyarkîrina protesto û daxwazan, ku gelek kes vî awayî bikar bînin û bi hezaran kes jî piştgiriya vê yekê bikin, li holê diyar-deyeke civakî heye."

Rast e. Jixwe pişti ku me bîra vê yekê bir, me ev xebat kir. Me tirkan hay jî hêvî û daxwazên kurdan nîn e. Lewre ew meseleyê fêm nakin. Ji bo ku em meseleyê fêm bikin, me ev xebat durist kir.

Dewletê got "Me serterorîst girt. Me koka wan qeland, nema dikarin şer bikin." Lî pişti ku Öcalan hate idamkirin an jî mehkûmkirin, wê gel bibîne ku mesele çareser nebûye, şer didome û leşker jî dimirin. Ji ber vê çendê gelê tirk, bi taybetî malbaten şehîdan, wê bi awayekî geleki xedar hêvîşkesî û xeyalşkestî bibin.

gas li mafen kesen din rez û hurmete digirin? Ev tiştekî geleki girîng e. Lê em di vî warî de durû û nejidil in.

Baş e. Civak çendî bo çareseriya demokratik amade ye?

→ Ev bi salan e ez bi hemwelatiye vî welati re, ci kurd û tirk, didim û distinim. Bo nimûne; ên ku zarokên xwe ji dest dane, berê xwe nadîn lihevkinî û aştiyê. Ka de were, tu yê ci biki! Her du jî doza tolhildanê dîkin. Bi doza tolhildanê, demokrasî û aramî peyda nabe.

Ma ey rewş naguhere?

→ Dê biguhere. Lê wisa lê tê ku temenê min têra vê yekê nake! Bêguman dê biguhere.

Wekî hûn jî pê dizanîn, Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan li Romayê pakéta çareseriye pêşkêş kiribû, naveroka belgenameya we jî ev pakêt anî bîra me?

→ Di sala 1996'an de me dest bi vê xebatê kir. Di dawiya vê salê de jî pira-

ber ku ev belge li ber destê Parlementoya Ewrûpayê û hikûmeta Amerika jî heye, wê bibêjin "Ev belge iradeya gelê te ya hevpar tîne zimên."

Gelo we ev belgename gihand ber-pirsîyarên PKK'ê jî?

→ Ev hineki girêdayî Öcalan e. Öcalan ji rîexistinê re negot "Çekan dey-nin." Ew, li gorî rewşê tevdigere. Wî, ev mesaj da: "Heta niha ez rîveberê şer bûm, niha jî rîveberê doza aştiyê me."

Baş e. Wê helwesta Tirkiyeyê çawa-be?

→ Qebûl nake, lewre ev yek wê Öcalan bike aliyê aştiyê. Ji ber ku dewlet vê yekê qebûl nake, wê PKK heta ku bikarîbe têkoşîna çekdarî bimeşîne; bêhtir xwîn, hêstir... Ev yek jî bo kurdan jî bêhtir êş û jan e.

Ger ev xebat û belgename riya lihevruñiştinê veke, dê encameke çawa derkeve holê?

→ Wê geleki bi xêr be! Ma me ev

Öcalan dibêje "Min heya îro wekî şervanekî, siyaseta xwe meşand, lê êdî ez dixwazim pêşengiya aştiyê bikin. Ev fersendek e, bi kar bînin." Ger hûn rastiyê bixwazin, ev rîbazeke baş e. Doz ji warê hiqûqî ve kete warê siyasi. Öcalan dixwaze di dîrokê de navê wî wekî avakarê aştiyê bê hildan. Lê ne dewlet, ne partiyêni siyasi, ne mehkeme û ne jî gel, ji bo vê yekê ne amade ye.

Doğu Ergil, gîlî û gazince xwe ji televîzyon û rojnameyan dike û dibêje "Bi dek û dola-ban ferma min rakirin. Ez ji medyayê veder kirim." Wî got, divê mirov guh nede medyayê, lewre ew tiştên jê re têne gotin dinivîse. Ergil ji bilî Serokatiya TOSAV'ê li Zanîngeha Enqereyê profesoriyê dike.

Bi kurtayî bila PKK jî wekî tevgerike siyasi bê hesibandin.

→ Belê. Belê, bi her awayî wisa ye. Dema min ev xebat pêk dianî, min ligel gelek kes û saziyan têkilî danî. Bo nimûne; bi navê William Jurî min gazî profosorekî amerîkî kir. Ev şareza û zanyarekî navdar e. Yanî em bê zehmet û dijwarî nehatin vê qonaxê.

Baş e. Li darê dînyayê gelek zana û şareza didin zanîn "Beyî PKK'ê Kêşeya Kurd naçe serî." Bi dîtina we çareseriyeke beyî PKK'ê çigas di cih de ye?

→ Dewlet tu caran nahêle ku Öcalan bibe avakarê aştiyê. Heya niha wekî aliye şer gelekî sude jê wergirt, peyre jî avête hundir. Dewlet wê Öcalan bi dar ve bike, ku neke jî wê cezayê heta hetayê (mubet) lê bibire.

Çêbû. Amerîkayê dema Öcalan radesti Tirkîyeyê kir, gelo got "Edî meseleyê çareser bike"?

→ Ez jî di vê baweriyê de me. Amerîkayê karibû miriyê wî teslim bikira, lê nekir. Bi kurtayî wiha got: "Ji bo çareseriye meseleyê ev fersendek e. Bi kar bîne."

Gelo Tirkîye wê vê fersendê bi kar bîne?

→ Ez jî başebaş pê zanim. Me dil kir, em di vî warî de şêwîrmendî û aqilmendî ji sistêmê re bikin. Sistêmê tiralî û zexelî kir, lewre me xwarin xistê devê wê. Ji bo rizgarî û lixwevegerîna sistêmê me ev xebat kir, lê ew ji ser a xwe nayê xwarê. Lewre divê têkoşîna çekdarî bi dawî bibe.

Baş e, dewlet PKK'ê qebûl nake. Lî li aliye din rîexistinê ku xwe wekî alternatifî PKK'ê pêşkêşî dewletê dikin jî, tene girtin. Bo nimûne; partiya Şerafettin Elçi.

→ Lewma divê çareseriyeke têvel (karma) bê peydakirin. Min di serî de jî ev yek pêşniyar kir. Kesên aqilmend, şareza û bêhnfireh divê li hev bicivin û bo meseleyê çareseriyeke peyda bikin. Her wiha divê aliye tûj û tundraw ên herdu a-



Prof. Dr. Doğu Ergil

liyan bêne kokirin (törpüleme).

Li aliye din diyar bû ku berpirsiyaren artêşa tirk di sala 1997'an de bi PKK'ê re têkilî danîne û doza gavêne aştiyane kiri-ne...

Tiştên bi vî rengî her tim diqewimin, lewre divê mirov zêde guh nedê. Heye ku diplomat an jî leşkerek biçe, lê ev ji bo lêkolandina rewş û helwesta aliye din e. Ev ne nîşaneya lihevkirin û peymanê ye. Bi kurtayî ji bo palandina (yoklama) rewş tiştên bi vî rengî têne kirin.

Di vî warî de tê gotin ku dubendî û nakokî di nava artêşa tirk de hene û baskê aştîperwer ê artêşê ev xebat daye destpêkirin.

→ Na. Ev kes bêyî hev û têkilî tevnerin. Bavê min leşker bû, ez pê zanim. Wekî her saziyê di nava artêşê de jî dîtinê cihê û cihêreng hene. Lî dîsa kes bêyî kesekejî din nakeve nava tevgerê. Ger xebatek bê meşandin jî, wê pişti biryara hevpar bê meşandin. Jixwe dawiya dawî gotina fermandaran diyarker e.

Ez pê zanim, generalekî gotiye "ji bo ku me daye pey Ergil, em li rojhilate bi ser ketin" li aliye din yekî jî gotiye "ji bo

ku em berevajî dîtinê Ergil tevgeriyan, em li rojhilate bi ser ketin." Pişti şerekî wisa, artêş nikare bi PKK'ê re rûnê. Ev ne mimkûn e. Bi tenê mirov dikare li ser çareseriye Kêşeya Kurd li hev rûnê.

Li hêla din di van 14–15 salan de, ji ber şer, neteweperiya tirkan gelekî xurt bû û li dora 2.5 milyon kesî li rojhilate (Kurdistan) şer kir. Wekî din dema leşkeriyê bi tenê dijminatiya PKK'ê nayê kirin, her wiha bi awayekî, djminatiya gelê kurd jî tê kirin, lewre tu nikarî van kesan razî bikî. Gelekî zehmet û dijwar e. Ji ber vê hindê, wekî min got, divê PKK bibêje "muhatap gel e." Wekî diyar e, Demirel carna dibêje "en li ciyê jî zarokên me ne." Demirel bi vî awayî dixwaze reaksiyonâ gel bipîve. Wekî tê zanîn, Demirel ji bo ku mirovekî gundî ye, gelekî hûrbijar (ihtiyathî) e. Berê jî got "em realîteya kurdan nas dikin", lê dît ku deng ji kesî nayê, wî jî dengê xwe nekir.

We dil heye hûn bi Öcalan re biaxin?

Ma wê şawa çêbe? Parêzerên wî nikarin başebaş bi wî re biaxin.

HEVPEYVİN: AZAD ALTUN

Me hevpeyvîn berî ku Doza Öcalan dest pê bike, ligel Doğu Ergil pêk anî. Pişti ku dozê dest pê kir, me dîtinê wî yên li ser dozê û helwesta Abdullan Öcalan wergirtin:

→ Min berê jî diyar kiribû, Öcalan ji ber ku baş pê dizane wê ji aliye hiqûqî ve cezayê herî giran lê were birîn, dixwaze dirûveke siyasi li dozê bike. Wî got "min heya îro wekî şervanekî têkoşîna xwe da, lê jî îro şûn de jî ez dixwazim pêşengiya aştiyê bikin. Ev fersendek e, bi kar bînin." Ger hûn rastiyê bixwazin, ev taqtîkeke baş e. Doza Öcalan ji warê hiqûqî kete warê siyasi. Öcalan dixwaze di dîrokê de navê wî wekî avakarê aştiyê bê hildan. Lê ne dewlet, ne partiyêni siyasi, ne mehkeme û ne jî gel ji bo vê yekê ne amade ye.

Lê li aliye din, ji xeynî van yekan, gelo wê Kêşeya Kurd bê çareserkirin an na? Bi dîtina min, ne dewlet, ne edaleta dewletê û ne jî gelê tirk ji bo çareseriye ne dilxwaz û amade ye. Ev yek, ne girêdayî Öcalan. Lewre tiştê ku ez herî zêde girêng dibînim ev e. Ev ne meseleya Öcalan e, meseleya kurdan e. Yanî dewlet ji bo çareserkirina meseleyê ne dilxwaz û amade ye. Dewlet doza axê dike. Ev gunditî ye û nêzîktedayneke prîmîtîv (ilkel) e. Lewre dewlet doza piştgirîya mirovan dikin, ne doza axê.

Wekî din talûke û xetereyeke mezîn li hêviya me ye. Wekî tê zanîn dewletê got "Me serterorîst girt. Em dê koka wan biqelînin, lewma nema dikarin şer bikin." Lê pişti ku Öcalan hate idamkirin an jî mehkûmkirin, wê gel bibîne ku meseleye çareser nebûye, şer didome û leşker dimirin. Ji ber vê çendê gelê tirk, bi taybetî malbatên şehîdan, wê bi awayekî gelekî xedar hêvîkestî û xeyalşkestî bibin.

Jixwe pişti min ev yek got, deriyê hemû televîzyon û rojnameyan ji min re girtin. Wekî diyar e, tevî ku ez li ser vê meseleye gelekî şareza û zana me, gazî min nakin, diçin gazî kesê bêkêr û beredayî dikin. Min got, meseleye û pêşengiya aştiyê bikin. Lewre dewlet doza piştgirîya mirovan dikin, ne doza axê.

Wêneyekî Çênekirî

Tuzanî canê min? Heke min destûr bida, minê wêneyê xwe ji te re bişanda wî layî. Niha tu dibêjî 'ez' dîn im; tu ji min bipirsî, ez dixwazim dîn bim. Wê hingê, min dikaribû wêneyê xwe ji te re bişanda wî layî. Bes ne ji van makîneyên bêkêr bibûya, ku rojê bihezaran wêneyan dikişinîn. Lê ku tu rastiyê bixwazî, heta niha yek wêne jî bi saxlêm derneçûye.

Na na, problem ne di makîneyan de ye, problem di min bi xwe de ye, ku di nava dûrbûna nîvmîtroyê de, nikarim dengê xwe bigihêjînim te.

Erê, erê! Tu wêneyekî min dixwazî dostê min, lê bi rastî ev ji bo min daxwazeke pir sext e. Roja ku tu mirî, ez dikarim wêneyê xwe bidim te.

Ev serdem bi destê min çênebûye dosto! Di vê sedsalê de tu kes wêneyê xwe nade bavê xwe, ji bilî ku albûmên bav û dost û bira û nasen xwe ji wêneyen xwe mişt bikin, kes tu karê din nake.

Niha li gorî min ez mamosteyê Wan Gogh im. Û heke ez şagirkê Wan Gogh bûma, minê wêneyê xwe li ser kartonê nîgar bikira û jî te re bişanda. Lê ez rî nadim xwe, ku ez wêneyê xwe çêkim û pêşanî te bikim; tevî ku rengê min ji tevahiya rengê siruştê bêhtir in, ji bo ku ez kesek im, ji nîjada meymûnên vê serdemê. Heke ez dînazor an gumgumekek bûma, minê çêtir xwe ji te re biresimanda. Çimkî pêdiviya dînazor û gumgumokan ji veşartina wêneyen xwe tune ye.

Heke ez papaxan bûma, min dikaribû dengê dirûşmeya şoreşê bigihanda wî guhê te yê ker. Mixabin, ez ne bazek im, ji yên mîna pîrika min i porhirî ya teşîrîş, ku genimê duhezar salî di nava bîst salan de bi destarê xwe yê nûjen hûrik hûrik dihêre.

Têla dengê min di kêlîka ewil, di nîvê dirûşmeya ewil de qetiya. Heke ez, ez bûma, min niha ji te re nedigot, "EZ û dengê xwe di riya azadiyê de dîl ketin."

Pêdiviya min bi gotinê te heye, dostê min! Ji te ditirsim, ji xwe û ji tevahiya însanan ditirsim. Hêzeke biefsûn di malzarakê de, ev tîrs di nava min de çandiye. Heke ez di vê hepsa mezin de ne dîl bûma, min nedixwest ez xewnen li ser azadiyê bibînim. A rast, ne ez ji xewnan hez dikim yên bi vî rengî û ne ez ji rewşa xwe gazinan dikim. Çimkî ez ji xwe ditirsim, ku wêneyê xwe çêkim û wî deynim quncikê pêşangeha wêneyen wan keçik û lawikênu ku her roj xwe di kujin, çimkî dixwazin bijîn.

Min bibexşîne dostê min... Bawer bîke sûc ne yê min e. Çi bikim ev serdem ne serdema ku mirov ji zindîyan hez bîke ye, kirin vê nîşan dide. Ji bo ku ez ji zindiyekî ji vê serdemê me, ji xwe ji hez nakim.

Ne bi destê min e, bavê min! Bavê min, ez bi vî rengî di malzariya diya min

de resim kirim; çimkî ez nikarim ji bili xwe ji kesekî re bêjim, "EZ aşiqê xwe me". Ev zirzagoneke qerasye canê min. Ez mîna beqeke zirnepelxî li pêpelûka bînim û ev zagon xaniyê min e tu dizanî? Ji bo ku ez xêndî xwe me, ji xwe hez dikim û ji van tabloyen li ser bejna diwarê hucre min daliqîne, yên ku pişti mirina wan min wêneyen wan mezin kirin, xistin çarçove û camekanan. Nizanîm çima ez bi evqasî ji van miriyan hez dikim? Tevî ewê mirtib, M.Şêxo, ku di zindîtiya xwe de tu rûmet nedît, her roj li taxa me dikir tinge ring û min silaba şerhê jî ji ser birî, hînga ku rahişt 'pîspîka şeytên'. Ev ê porsipî, Cegerxwîn, ji bo ku rojekê di mizgeftê de Fatîha çewt xwend, gundiyan got "Melê me xurifiye" û min bi kulmikan ew ji hev de xist û gêri biniya gund kir.

Axx dosto! Ezê rojekê ji ber hezkirina van miriyan bi eşâ dil herim.

Ha te got ji dosto? Hinekî din dengê xwe bilind bikî, ez fêm nakim. Erê, erê... Tu dîsa wêneyekî min dixwazî. Malxirabo tu çi zilamekî bêsebrî, tu çiqas kirê li mirov teng dikî. Ez nikarim, nikarim ni-karim ni.... Ma tu dizanî ku ez di vê hepsa biçûk de jî ne xwedîli tîştekî mezin im?

Heke ez rast bêjim, ev cîhana xwe min ava kîriye. Hostayê van derî û derabeyên qerase, ez bi xwe me. Lî ez nikarim dosto! Ez nahêlim ku wêneyekî xwe ji te re çekim. Oda min tarî ye, rengê min ji tev li nava tariyê belav bûne. Heke min destê xwe bidîta, di nava vê tariya baş de, minê ew dirêjî sînga ci-yayekî bilind bikira û xwe li wî resim bikira.

Dibêjîn hin keçik û lawikênu porgijik li wan deveran rengê xwe tevî hev dikin, ka nizanîm wêneyê ci çedikim?

Axx canê min bawer bike ez pir daxbar im. Lî madem ku tu ew qasî wêneyê min dixwazî, rabe zû biçe malê, li wêneyê xwe binihêre, tu yê min di wêneyê xwe de bibînim.

H.KOVAN BAQÎ

Bayê Bin Baskê Çivîkan

Ji dilê min nêziktir, hevalê min merhaba. Tu dibêjî xwe biparêze. Nabêjim ji ci û ji kî. Tu ji min çêtir dizanî, belê. Ji kuçen bajêr tu dizanî, ji diwarên qulqulkâ. Ü ji xwêdana cemidî. Ji gundên şewîti ji tu dizanî, ku her dem tu ji pê re dişewittî. Ji kemînên ber deriyan, kemînên zingargirtî yê tarî û vegetandinê. Ji şevê tam barûdi tu dizanî. Qet nebe tu ji gulên bêrûmet, yên bêwext û

bitirs, ku li
p a s
s t ü y a n
diket, tu
dizanî. Ü
y e n
koçbûy-
inê jî
ne!

Ne ji tîştekî
dibêjim koçbûn. Qesta
min ne dîlşestina te
ye. Dizanî, her dem
bi dil tu li vir dijî.
Xwe biparêzim, lê
çawa? Bi koçbûnê
ma? Bi koçbûnê
xwe biparêzim. Te
ji koç



kir, belê. Lî
birînê te li vir neman qey? Li
vir man. Ü yê nûtir ji her roj te
dişînîn. Wê kî wan hilgire ma. Birînê
te yanî. È kevin û yê nû. Ku hé jî didome.
Wê kî hilgire?

Ez çawa xwe biparêzim hevalê diltenik?
Xwe bispérîm ci an kê, da ku bême
parastin? Ez têkevîm hêlinê çivîkan qey?
Di bin baskên bajêr de nayêm veşartin. Tu
ji min çêtir dizanî. Zarokên bêbav, zû min
didin dest. Di şevê û wir de jî, xwîna min
qesâ digire, bi rivînê eger yê ji derdorê gur
dibin. Yê dîrok û pêşeroja me pê re tê
şewitandin.

Çawa xwe biparêzim, xwe bispérîm ci

an kê, da ku bême parastin? Ma ez xwe di
qulikên mişk û maran xim? Mîna kundê
gundê xwe, ji xwe re qelşteka di tatan de
bibînim. An mîna Nebî Berhîm ji ber xeze-
ba Nemrûd li ber hîman ku navê wî ji vir tê,
xwe veşîrim; ji bo ku agir min neşewîfîne,
ji bo ku jiyanâ min a ji bo te bi qîmet e,
bidome ci bikim û xwe çawa biparêzim?

Li ser baskên çivîkan mexel bêm û bifir-
im qey? An jî. An jî na, bibim bayê bin
baskê çivîkan, ji bo ku hûn jî li ser baskê
çivîkan rûnên û bifirin. Bifirin û disa
bifirin. Bibim bayê bin baskê çivîkan ne?
Hevalê ji dilê min nêziktir min, bibim bin
bayê baskê çivîkan. Birînê te yên li vir yên
ku min hilgirtine vê dibêjin. Ji ber ku
nişana azadiyêne bask vê dibêjin.

Ma qey ci ye mirov hevalê delal, bi ci tê
naskirin?

Mirov ne bi dest û piyên xwe, bi çav û
devê xwe, bi guh û pozê xwe tê naskirin. Ne
bi dil û gurçikên xwe û ne jî bi zindîtiya xwe
tê naskirin. Mirov xwedî nîrû û kesayeti
rûmet e. Bi wan tê naskirin û bi wan dijî.
Rûmeta wî ya herî mezin, jîxwe ji peyd-
abûna fîkr û ramanê mirovatiyê tê. Ji
kesayetiya civakî, ji welatê wî tê. Ji serxwe-
bûna wî.

Di dema ronahî û firehiyê de xwedî der-
ketina li wan pêwîst e û di dema tarîti û ten-
gasîyê de tékoşîna ji bo wan rûmet e.
Fedakirina can, ji bo wan.

Ji pir tîştan dikare hêviyên xwe qut bike
mirov. Destîn xwe jê bişo, lê ji tîştan
nabe. Ji ber ku mirin e nabe, ji ber ku tarî
ye û bi jehr û seqema xwe debar e, nabe. Ji
ber ku mirin e, ne tenê mirina mirov, miri-
na gel e û di nava tariyê de xwelî bi ser de
dibare, bê pêşeroj dimîne. Bêrûmet.

Nabe.

Belê rast e. Li jiyanâ xwe xwedî der-
ketin; li zar û zêçen xwe, li malbat û
hevalen xwe, li dil û evînên xwe, heyâ li
xwarin û vexwarinên xwe, li aborî û malê
xwe, li çand û hunera xwe, li civak û gelê
xwe, li nirx û kesayetiya xwe, li dar û daris-
tanen xwe, li gul û gulistanen xwe, li çiya û
berwarin xwe xwedîderketin. Li wan jî
xwedîderketin rast e, pêwîst e û a herî rast
li welatê xwe...

Ku têkevî tengasîyê mirov, ku derşet jê
re nemîne, şevê reş û sar, bi tarî û seqema
xwe wî dîl bigire. Ku hêvî ji aştiyê re
nemîne, xemxwarin ne derman e. Razana di
ber palan de û di ber siya hîman de veşartin
ne derman e. Tu kes şewqa birûskan bi dest
naxe. Bi birûskan re her tîş di wêneyekî
xerab de diqefile. Melisina li bin kulina an
a bin kirâsê nebiyan ne çare ye.

Neçar e.

Ku mirov zanibe li ci xwedî derkeve û ci
fedâ bike, hevalê delal? Çare, çare
xwedîderketin e. Fedakirin e çare.
Amadekirin û xwepêcan e.

İRFAN AMIDA

Di çapemeniya Cîhanê de Doza Sedsalê:

Ji bilî şer tu rîbaz nayê pejirandin

Rojnameya Misirê Al Osboa di hejmara xwe ya roja 31'ê mehê de daye zanîn ku destê Öcalan ê ku ji bo aştiyê rabûye, dê li hewa bimîne. Di nûçeyê de li ser helwesta neyinî ya dewleta tirk hatiye rawestandin. Di vî warî de dîtinê Doğu Ergil jî cih girtine. Ergil gotiye ew doz ji bo çareseriyê firsendek e. Lê dê dewlet vê derfetê bi kar neyine, lewre ew çareseriyê naxwaze.

★ BEŞA NÛÇEYÊN DERVE

Doza Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, ku wekî Doza Sedsalê tê binavkirin, di 31'ê ulana 1999'an de li Girava Îmraliyê est pê kir. Daxuyaniyên Öcalan û arêznameya wî di çapemeniya cîhanê telekî deng veda. Daxwaza Öcalan a ji yo yekîtiyeke demokratik, di navbera urdan û tirkan de, ji hêla gelek nûçegianen biyanî ve jî wekî nîşaneyâ tirsê û newla xwe rizgarkirinê hate nîşandayîn. Tevî ku Öcalan di roja duymîn a dariandinê da zanîn ku wî hest û ramanen xwe li ser çareseriyê anîne zimên jî ev dîtin neguherin. Lê piştî ku Konseya Serokatiyê ya PKK'ê piştevaniya xwe ji Öcalan diyar kir, ew helwest hinekî guherî, lê disa jî heman ramanan di na-a nûçê û nirxandinan de cihê xwe past. Li nik vê yekê gotinên Öcalan ên li ser karê tilyakê, kuştina kesen sivil û ekiliyên rayedarên tirk û dewletên din e ji nava nûçeyan cîhekî berfireh girîye.

Ji çapemeniya cîhanê çend mînak: CNN: Serokê serhildêren kurd Abdullah Öcalan ji hikûmeta tirk şansek ji bo aştiyê xwest ji bo dawî li şerê kurdan 15 salan bîne.

Öcalan got: "Heke rê were vekirin ez tukarim di nava 3 mehan de hemû mirovîn li çiyayan deynim xwarê. Lê heke ey yek neyîn pejirandin, dê di şer de sedhezaran mirov bêne kuştin."

New York Times: Öcalan dide ber dilê dewletê

Ji Rojnameya New York Times Stephen Kinzer, ku yek ji wan kesan ku maflî şopandina dozê bi dest xistiye, da-ye zanîn ku Öcalan bi helwesta xwe her tes şaswaz hîsiye. Li gorî Kinzer, Serokê PKK'ê Öcalan daye ber dilê tirkan bi taybetî daxwaza xwe ya ji bo alîkaya bi dewletê re anîye zimên. Bi vê yekê jî, wî xwestiye ji derûniya tirkan du dewletê di ser her tişti re digire sûdê vergire. Li gorî Kinzer, Öcalan dixwaza bi vî awayî general û siyasetmedarên

dewleta tirk mecbûrî helwest girtinê bîke. Lewre biryara çareseriya ku Öcalan pêşniyaz dike, bidin ku ew jî beramberî mafêñ çandî û kutakirina şerê çekdarî ye.

Dengê Amerîkayê: Serhildêren kurd piştevaniya banga aştiyê ya ji hêla serokê wan ve hate kirin, dîkin. Lê daxwaza wî bi cih naynin.

Li gorî şiroveya Radyoya Dengê Amerîkayê PKK'ê piştevaniya gotinên Öcalan kiriye, lê digel vê yekê jî ji bo wan daye zanîn ku heta ji hêla dewletê ve hinêk gavêni ji bo çareseriya Kêşeya Kurd neyîn avêtin, ewê çekêñ xwe bernedin.

AFP: PKK piştigiriya banga Öcalan a ji bo qedandina şerê li dijî Tirkîyê kir.


Di vê nûçeyê de AFP'ê bi berfirehî cih daye daxuyaniya Konseya Serokatiyê ya PKK'ê. Ajansê ji daxuyaniyê ev rîz dane:

"Em dibêjin şerê ku 15 salan didome bes e. Bi vê baweriyê em dibêjin, di domandina vî şerî ji bo kesî fêde nîn e. Bi vê baweriyê em hêvî dîkin ku bi pêkhatiya çareseriya demokratik riya aştî û bîratiyê vebe. Partiya me bi hemû şaxên xwe bi yekîti û lihevkirineke xurt li piş daxuyaniyên serokê xwe ye. Em bangî hemû partî, gel û dosten xwe dîkin ku ji bo pêkanîna daxwazên Serok Apo her tişte pêwîst bikin."

Di nûçeyê de serwextkirina PKK'ê ya di warê wekî nîşaneyâ qelsiyên dîtna vê bangê jî, disa ji daxuyaniya navborî hatiye dayin: "Ewê nêzîkdayin xeliyiha herî mezîn e. Heke pêwîst bike em amade ne û xwedî wê hêzê ne ku em şer bidomîn." Di nûçeyê de reaksiyonâ Demirel a li hemberî dozê jî hatiye pêşkêşkirin. Demirel disa banga teslim-bûnê kiriye. Li nik vê yekî çalakiya gerîla ya xwefedayî ku roja 2'ye pûşperê li Şîrnexê pêk hatiye jî, di nava nûçeyê de cihê xwe girtiye.

Washington Post: Serokê serhildêran çalakiyên hikûmetê yên vesarî yên bo aştiyê eşkere kirin.

Ji rojnameya navborî di nûçeyeyeke xwe ya roja 2'ye pûşperê de Amberin Zaman gotinên Öcalan ên li ser têkiliyên



PKK û rayedarên dewletê derxistiye pêş. Di vê nûçeyê gotinên Öcalan ên li ser têkiliyên bi Turgut Özal re, di sala 1995'an lihevrûniştina rayedarên PKK'ê ên Ewrûpayê bi serhengekî (albay) tirk re û du nameyên Serokwezîrê berê Necmettin Erbakan cih girtiye. Di nûçeyê gotinên Öcalan ên bi rengê "Ez her tim li dijî kuştina sivilan derketim." jî cihê xwe girtiye.

AFP jî di nûçeyâ xwe ya roja 2'ye pûşperê de giranî daye ser heman mijarê. Di nûçeyê hatiye gotin ku Öcalan berpirsiya êrîşen li dijî sivilan xistiye komikên li derveyî kontrolê. Li pey agahîyen ku di nûçeyê cihê xwe girtiye, Öcalan bi van gotinan berpirsiya van çalakiyan nepejirandiye: "Li ser çalakiyên li hemberî sivilan, ku di navbera salên 1987 û 1996'an de pêk hatin, di nava PKK'ê de dubendiyek hebû. Min tu caran fermaña êrîşen li hemberî hedefen sivil neda. Êrîşen bi vî rengî bi destê kesen li derveyî kontrolê yên di nava PKK'ê de pêk hatine."


Her wiha Öcalan daye zanîn ku heke wî rî li ber negirta, dî çalakiyên xerabtir jî pêk bihatana.

Li gorî nûçeyeyeke Reutersê ya roja 2'ye pûşperê jî Öcalan bal kişandiye ser politikayê İngilistanê yên li ser Kêşeya

Kurd. Li gorî nûçeyê Öcalan wiha gotiye: "Di destpêka salên 1990'ı de min li hemberî hêzên ku dixwazin me bi kar bînin, têkoşîn da. Di vî warî de helwesta İngilistanê tê zanîn. Ew niha êrîşî min dike û daxuyaniyên li dijî min diweşîne. Ev dewlet dixwaze kurdan li gorî berjewendiyen xwe bi kar bîne û dixwaze kurd her tim ji bo Tirkîyê wekî kêşeyekî bimîne. İngilistan li ser Kêşeya Kurd xwediye politikayeke dûvedirêj e û me 150 salî bi vê politikayê re jiyana xwe domand. Ev dewlet hin mirovan li gorî berjewendiyen xwe bi kar tîne û paşê jî datîne aliyekî."

Rojnameya Misirê Al Osboa jî hejmara xwe ya roja 31'ê mehê de daye zanîn ku destê Öcalan ê ku ji bo aştiyê rabûye, dê li hewa bimîne. Di nûçeyê de li ser helwesta neyinî ya dewleta tirk jî hatiye rawestandin. Di vî warî de dîtinê Doğu Ergil jî cih girtine. Ergil gotiye ew doz ji bo çareseriyê firsendek e. Lê dê dewlet vê derfetê bi kar neyine, lewre ew çareseriyê naxwaze. Di nûçeyê de li ser mafêñ kurdên ên çandî û qedexeya li ser zimên jî hatiye rawestandin. Di dâwiya nûçeyê de hatiye gotin ku ji bilî çareseriya leşkerî di rojîn pêş de tu çareserî nayê pejirandin.

Ciroka xwedyiyê surê giran,



Pîrê qederekê li derê hewshê rûnişt, berêvarkî Hemzeyê Pêlewan jî ji nêçirê hat. Hemze meyizand ku pîreke cilperîf li derê hewshê rûniştîye. Hemze got xaltîkê tu bi xêr hatî, tu ji ku derê tê û têyî bi ku ve herfî.

Kurkê min ez çi bikim, mala bavê kaliyîne bi xana Xwedê be, hevalê min ez li paş hiştim, nexwe vêga ez bûbûm hecî.

– Nexwe wilo ye xaltîkê?

– Erê bi cidê bavê kim wilo ye.

– Çima tu naçî xêni?

– Kurkê min, min ji pîreka te pirs kir, hûn mîvanan nahewînin? Gote “EZ bêyî mîre xwe nikarim mîvanan bihewînim.”

– Stûwê xwe şkandiye. Mîvanekî weke te bi ser miho de were û miho nehewîne. De ka here banî, tu kengî bixwazî tu mîvana me yî, heta bêhna te ji me teng nebe nece.

– Ih kurkê min, ez çiqas ji te razî bim, Xwedê jî ewqasî ji te razî be.

Rojek çû, du roj çûn, em bêjin pîrê du heyvan ma li mala Hemzeyê Pêlewan. Hemzeyê Pêlewan, rojina diçe nêçirê, rojina naçe. Dîsa rojekê ji rojan Hemzeyê Pêlewan çûbû nêçirê. Xecê û pîrê jî li eywana qesrê rûnişibûn. Pîrê ji nişka ve kesereke kûr anî xwe, got: “Aax, axx.”

Xecê got, “pîrê çi bû, çi hate bîra te?”

– Keçkoka min ma ci nayê bîra min.

Pîrê qederekê ma bê deng, dîsa got, ‘a aax.

– Pîrê çi bû, çi hate bîra te dîsa?

Keçkoka min ez nebêjîm çêtir e, ne hewce ye ez serê te bişşînim.

– Ez bi qurbanê pîrê, tuyê çi bêjî bêje, lê tu nebêjî jî ezê bifetisim. Pîrê got: “Keçka min, dilê min bi te dişewite, tu her û her li van ciya yî, tu ne mirovekî biyan dibînî, ne bajarekî dibînî, vêca ma jiyanâ te jî jiyan e.”

– Pîrê nexwe em çi bikin?

– “Tu zanî keçka min, ez ji nava bajarê Cizîra Botan im, jixwe kurê mîrê me ji xwe re li jinekê digere, ma wê yekê ji te xweşiktir li ku derê bibîne.” Xecê got: “Pîrê ma qey tu nizanî ez bi mîr im, ma ezê çawa ji mîrê xwe quṭa bim?” “Keçka min ma mîr di darê dinê de qeliyan, ne mîrê te be?”

– “Pîrê nexwe tu dibêjî mîr ji mîrê min bi bejn û baltir hene?” “Çawa nîn in keçka min. Mirov dibêje qey te ji binî ve dinya nedîtiye.

– Erê pîrê, ez dixwazim bi te re werim, lê em dê ci ji Hemzeyê Pêlewan bîkin? Pîrê got: “Keçka min, tu qet xem neke, emê wê pirsgirêkê ji çareser bikin. Tu zanî keçka min dema ku mîrê te hate malê, jî pirs bike bêje mîrko tu bi ci tê girêdan, ewê hingî bikeve xefka me de, heci mîrê te ye, ji xwe pir qaîl e.” Hemzeyê Pêlewan êvarî ji nêçirê hat. Wê rojê Hemze dîsa nêçîreke baş kiribû. Bi şev hersêkan li ber bixêrikê şîva xwe xwar. Pala xwe dane palgehêk kurmancî, bû kuş kuşa Hemzeyê Pêlewan, qelûna xwe dikuşkuşand. Xecê got: “Mîrko niha ewqas sal in, ez û tu yê hev in, te rojekê negot ez bi ci tême girêdan.

– “Tu zanî hermet, ez bi qeyda hespê xwe tême girêdan.” Xecê rabû çû qeyda hespê Hemzeyê Pêlewan anî û destên Hemze kirin qeydê. Çawa Hemzeyê Pêlewan destên xwe ji hev birin paş, qeydê got çiring di nîvî re qetiya. Xecê got: “Mîrko eve te vir kirin, tu ne bi qeyda hespê xwe tê girêdan.” Hemze got ‘nexwe here tenga hespê min bîne.’ Xecê vê carê çû tenga hespê anî. Tenga hesp li dest û lingêñ Hemze girêdan lê tengê jî xwe li ber Hemzeyê Pêlewan negirt, teng jî qetand. Xecê got: “Mîrko tu bi serê wî kurê xwe yê delal kî, vê carê rast bêje, tu bi ci tê girêdan?” Hemze got: “Hey dîna dîn, ez bi mûyê dûvî hespê xwe tême girêdan.” Xecê vê carê çû mûyê dûvî hespê jê kir. Mû anî li dest û çengêñ Hemze pêça. Hemzeyê Pêlewan, çawa ku herdu çengêñ xwe şideh dane, paş mûwî dûvî hespê wî, li hestiyen çengêñ wî sekinîn. Xwînê got tu here, ez hatim. Hemzeyê Pêlewan di xwînê de sor bû. Çermîn laşê Hemze bi ser de hat. Bû nale nala Hemze. Ji ber êşa laşê wî, dengê nale nala Hemzeyê Pêlewan ji erdê diçû ezmanê heftan. Serê êşehayî, edî ne hewce ye desmalê bû. Hemze carekê hatibû xapandin. Edî ci bigota, Hemze mecbûr bû bike. Edî ji Hemzeyê Pêlewan re rîwîngîya mirin û mayînê dest pê kiribû. Pîrê rabû hevsarê hespê Hemze

Hemzeyê Pêlewan

avête nîvî noqa Hemze û hefsar bi qûş a hespê wî ve girêda. Şûrê wî kir ber kurtanê hespê wî de. Pîrê, Xecê û kurê Hemze li hesp siwar bûn û berê xwe dane Cizîra Botan. Rojekê heta êvarî bi rê de çûn. Çûn û hey çûn, heta gîhane nava bajarê Cizîra Botan. Hemze bi wê birîndariya wî ve birin derê koçka kurê Mîrê Cizîra Botan. Kurê mîr Şero, derkete derê koçkê, halo meyizand ku pîrê û Xecê, kurek bi xwe re anîne û Hemzeyê Pêlewan jî di xwînê de sor bûye û bi hefsarê hespê wî girêdane. Şero got: “Pîrê tu li ser serê min û bavê min hafî. Tu here gencînê, bêm te bi dilê te xelat bikim.” Pîrê sêhrebend giha armanca xwe û Hemzeyê Pêlewan jî danîne ber dirênceka koçka mîr. Rabûn gayek guran din û kevel kirin. Kevelê ga bi ser Hemzeyê Pêlewan de anîn. Kevelê xwîkirî, birînê Hemzeyê Pêlewan peritandin û şewitandin. Şûnikekî şûstina cila danîne ser pêpelûka ewil a dirêncekê. Şero got: “Heçi kesê ku di ber Hemzeyê Pêlewan re derbas bibe, bila şûnikekî lê bide.” Xwarina Hemze ji goşte xezalan, ketibû qetek nanê hişk ê tîsî. Heçi kesê ku dida dirêncê da ku here jor, dirahişte şûnkê cilan, digotin tep şûnikek li Hemzeyê Pêlewan didan. Dema ku kurê Hemze di ber re dîborî, dilê wî bi bavê wî dişewîfi. Dirahişte şûnik, hêdîka li bavê xwe dida. Hemzeyê Pêlewan çend salan ma di wê rewşê de. Di wê navê de keçkeke Xecê çebû û kurê Hemze jî hê mezinâr bû. Rojekê ji rojan, Şero û Xecê zarakîn xwe bi xwe re birin, çûn ber Çemî Dîcle seyranê. Çûn li ber çem li binê çinarekî rûniştin. Xwarina xwe vekirin. Meyizandîn ku tiştek ji bîr kirine. Şero got: “Keçâ min, tu û birayê xwe herin malê, de ka hûn tişten me yêni ji bîr kirî naynîn.” Rabûn, keçik û kurik ketin ser rê, hatin malê. Hemze got: “Kurê min, ez dizanîm tu ji min hêz dikî, lê tiştek ji te nedihat, lê vaye fro tu karî qenciyê bi bavê xwe yê dîl bîkî.

– “Yabo ez dikarim ji bo te ci bikim?”

– “Meyzêne kurê min, şûrê min di lîskê mirîşka de ye, bîne vî kevelî tayê wî qut bike û mûwî bi destên min ve jî qut bike, ez tişteke din ji te naxwazim.” Kurik got: “Yabo ez nikarim rahêjîm şûrê te, şûrê te giran e.”

– “Kurê min tu kurê Hemzeyê Pêlewanî, çawa tu nikarî rahêjî şûrê bavê xwe? Ka here pêşiyê biceribîne, hingî emê zanibin ka tu karî rahêjî an tu nikarî.” Kurê Hemze çû ji bin lîskê mirîşkan şûrê bavê xwe kişand û anî, hêdî hêdî ew kevelê dirûtî tayê wî qetand û mûwî bi destên bavê xwe ve jî qetandin. Hemze careke din kevelê ga li xwe pêça. Keçâ Şero dît ku kurik destên bavê xwe vekirin; keçikê got: “Bi Xwedê ez dê ji bavê xwe re bêjim, te destên bavê xwe vekirin.” Kurê Hemze rabû ji dilê xwe duayek kir, got: “Xwedê bîke, keçik here di kaşekî de bikeve û di-

ranen wê di zimên de herin xwar ku êdî ziman lê negere.” Keçik û kurik bi rê ketin da ku herin cem dê û bavê xwe. Çûn çûn, gihane kaşekî, lingê keçikê li kevirekî ali-qî û bi dev ve çû erdê. Diran di zimên de çikizîn û dev û dimaxê keçikê tijî xwîn bûn. Heta keçik giha cem bavê xwe tiştek li bîrê nema û ziman di dev de negeriya. Bû êvar, Şero û pîreka xwe û Xecê bi rê ketin hatin koçka xwe.

Xecê mîrekî nû kiribû, bi dest û dilê xwe bû û kîfa wê li cî bû. Her û her ken li ser rû bû, haya wê ji bayê felekê nemabû, ji xwe re digot: “EZ nika hatime dinê” ma wê ji ku zanibûya Hemzeyê Pêlewan destê xwe vekirine û weke bazekî li hêviya nêçîra xwe rawestiyaye. Seva tarî bi ser bajare Cizîra Botan de hat. Bû çirçırka sisirkan û bû qur qura korılıka, li koçka mala mîr hemû kes ketin xeweke şîrîn û Hemzeyê Pêlewan ji nava kevelê ga derket, bû reqe reqa kevelê ga. Şero ji xew şiyar bû. Got: “Çermo ci xire piştâ te ye, te ci di xewna xwe de dît?” Hemzeyê Pêlewan got: “Mîrê min, min di xewna xwe de didît bazekî zend zér dikete nava cil mîrî de, deh dikuş, di mane sih mîr.” Şero got: “Tu li wê xewne razê, tu dê gelek xewna bibînî.” Şero bi xew ve çû û Hemzeyê Pêlewan rahişte şûrê xwe, da devê çekê, hilgeriha jor, kete nava leşkeren Şero de, serê dehan jê kir, ma sih leşker. Şero dîsa şiyar bû got: “Çermo dîsa ci kefte lefta te ye? Tu di çermikê xwe de natebiti.” Hemzeyê Pêlewan bersiv da got: “Mîrê min, min dîsa heman xewna dît, ez hişyar bûm.” Şero got: “De razê çermî çerm.” Şero dîsa bi xew ve çû û Hemzeyê Pêlewan rabû kete nava leşkeren Şero; yek nehiş. Serê hemûyan di ber re jê kir. Rabû çû serê Şero jî jê kir. Çû raserî Xecê rawestiyâ got: “Xeeeeecê de ka rabe ser xwe û bibîne ka ji min û Şero ki mîrtir e. De rabe pîreka kurê mîro, weleh hûn çûbûna ber perê rojê ji felatiya we dê ji destê min nebaya.” Xecê halo rabû li dora xwe meyizand ku ne nobedar mane, ne ji mîrê wê maye. Hemzeyê Pêlewan serê hemûçikan jê kiriye û koçka mala mîr ji xwînê kiriye bêr. Xecê got: “Mîrko ez di bextê Xanî Baba de me, tu min nekuji, min bide xatirê wî bavê ku tu pir jê hez dikî.” Hemze got: “Xayina xayin, de bila tu bi qurbana nênukeke bavê me Xanî bî. Welehi te xwe nekiriba bextê wî ewliyayî, minê piçê te weke guhê te lê kiribana.” Hemzeyê Pêlewan rabû hemû kulek pace û derî girt û Xecê hişte li pişt derî. Bi çepîle herdu zarokan girt li pişt xwe siwar kir. Dîsa berê xwe da qesra xwe ya kevin a ku di nava çiyayen Botanê de avakirî. Hemzeyê Pêlewan weke pîlewaniya xwe derket û giha miraza xwe û hûn jî bigîhê mirazî xwe. (Qediya)

Jînenîgariya 'Rojê'

Wesânxaneya Zelalê bi navê "Doğuda Yükselen Güneş (Rojâ ku li Rojhilat berz dîr" pirtûkek ku ji du cîldan pêk tê derist. Pirtûk ji aliyê M. Can Yüce ve hatî amadekirin û li ser jiyana Serokê Giştî û PKK'ê Abdullah Öcalan e. Digel jînenîgariya Öcalan dîroka PKK'ê ji di nava spîlênen pirtûkê de cih digire.

Di pêşgotina cîlda yekemîn de M. Can Yüce li ser sedema vê xebatê wiha dibêje: Di sala 1995'an de hevreyekî min di nameyeke xwe de gotibû, 'Serok nivîsên te ên ku di rojnameyan de têne weşandin, lixwîne û diecibîne, lê dibêje, 'Di vê pêvajoyê de ev nivîs êdî têre nakin û divê tu hinekî din karşertir û berfirehtir binivîsi ger tu xebateke wiha bikî em dê ji piştgiriya te bikin.' Yüce ji vê nameyê ji xwe e wekî talîmateke birûmet dibîne û dest bi xebatê dike. Lî ew dîsa dide zanîn ku ji wî omanek dihat xwestin û ev ji wî ditîrsîne. i ber ku berê hîç roman nenivîsandine. Gelekî li ser difikire û dûre biryar dide ku likare li ser biyografyaya Abdullah Öcalan binivîse. Bi handana hevreyen xwe, bo iñvîsandina biyografîyayê pêşnûmayekê anade dike û ji bo nîrxandinê dişine ba Öcalan. Ji wî ji bersiveke erêni distîne, bi dil can dest bi xebatê dike.

M. Can Yüce dide zanîn ku di salekê de cîlda yekemîn xelas kiriye lê ji ber istengiyen li ber peydakirina çavkaniya berhemeye li gorî dilê wî derneketiye holê. Her wiha ji ber rewşa zindanê di hîman de wî xebata xwe daye rawes-



tandin.

Di destpêka pirtûkê de ji berê pirsa çîma: "Rojhilat" û çîma "Roj" dike û bersiva van pirsan di nava pirtûkê de bi vî awayî dibersivîne: "Kîjan kurdî peyva 'Rojhilat' û 'Rojhilatî' nebihîstiye? Bi peyva 'Rojhilat' û 'Rojhilatî' kîjan kurd biçûk nehatîye dîtin û lê tade nehatîye kîrin?" Dîsa dide zanîn ku Rojhilat înkara Kurdistanê û Rojhilatî ji wekî înkara kurdan hatîye bikarânan û di pergala dagirkeran de li şuna kurd û Kurdistanê de ji wan re bûye "nasname" ya nû. Rojhilatî, bînasnavî bû û 'Rojhilatî' ya nû ji kurd û Kurdistan bû û bi Rojhilatî ya kevn re şer dikir. Û wiha diripse: "Ev jixweber çêbû? Na! Ev lihev-

nekirin û büyîna ji bo nasnameya nû li Rojhilat bi hilatina rojê re dest pê dikir." Piştre ji vê dibêje: "Roj ji rojhilat hiltê. Herkes vê dizane. Ma cihê ku herî zêde pêdivîya wê bi rojê hebe, li vir derketin û bilindbûna rojê nexwezayî ye?" Li gorî baweriya Yüce roja ku kurd li bendê bûn di tarîtiya sala 1970'yî de derket û ji ber van sedeman 'Rojhilat' û 'Roj', hêmaya ku herî baş rastiyen Abdullah Öcalan nişan didin in.

Dîsa ji bo pirseke 'Çîma xebatek wisa' ji van tiştan dibêje: "Biyografîyaya Öcalan di heman katê de dîroka PKK'ê ye û ew wekî goşt û neynûk in û ji hev nabîn." Mînakeke din ji ev e: "Bi awayekî vejin û rabûna kurd e. Kurteçiroka Serok Apo kurteçiroka tekoşîna PKK'ê û vejîna kurdî ku radibe ser piyan e."

Her du cîldîn pirtûkê ji xeynî pêşgotinan her yek ji se beşan pêk tê. Di pirtûka cîlda yekemîn de, beşa yekemîn de li ser jiyana zarokatî, xortanî, taybetî û serhîldan ên Öcalan tê rawestandin.

Jiyana Öcalan ya zarokatî balkêş û taybetiyen wî yê zarokatiyê taybetiyen wî yê serokatiyê ji şanî mirov didin. Lewre wekî ku di pirtûkê de hatîye nivîsin wî di zarokatiya xwe de wekhevî parastiye. Dîzîtiya kedê nekiriye û kesê ku dizîtiya kedê bikira li hemberî wî/ê bi hêrs rabûye.

Beşa duyemîn a pirtûkê wekî gavavetiña şorese (1969-1973) tê binavkirin û têde qala xebatê Öcalan ên wê demê, naskirina sosyalizmî, jiyana wî ya Stenbolê tê kîrin. Beşa sêyemîn a pirtûkê ji kemilîna ideolojîk a komê radixe ber çavan.

Cîlda duyemîn a pirtûkê ji xeynî pêşgotinan ji se beşan pêk tê. Di pêşgotina wê cîldî de M. Can Yüce li ser diyalogên wî û Sema Yüce disekine. Dîsa di vê beşê de nameyên Sema Yüce û Fikri Baygeldi ji cih girtiye. Di vê cîldî de pêvajoya 1977'an û heta derbeya 12'yê Rezberê radixe ber çavan. Di pirtûkê de mirov dikare Berxwedana Hîlwanê, xebatê li dijî ajanan, li ser Manîfesto û gundê Fisê, krîza rîexistinê, derketina derveyî welêt, girtinê Elezêzî û hwd. bibîne.

Wekî dawî mirov dikare bibêje, zimanê pirtûkê sivike û lewre xwendekareke/i dibistana seretayî û xwendekareke/i zanîngehê ji bi hêsanî dikare bixwîne. Dîsa di her du cîldan de tu tiştîn neyîn yê ku di dîroka tekoşînê de derkette jî nehatîne veşartin. Ji bo kesen ku dixwazin PKK'ê û Serokê wê binasin çavkaniyeke baş derketye holê.

CEMİL ANDOK

Bêdadiya Sedsalê

HASAN KAYA

Cavên milyonan li roja 31'ê gulana 1999'an bû. Lewre wê rojê dadgeha Serokê gelê kurd Abdullah ÖCALAN dê bîhata İldarxistin. Wekî ku nav lê hatîbî kîrin, 'Doza Sedsalê' dê wê rojê dest pê bikerâ. Her çiqas navê dadgehê lê hatîbî kîrin ji hemû mirovahîya xwedî wîjdan û mirwet bas dizane ku ev dadgeh dê bi navê 'Bêdadiya Sedsalê' were bibiranîn. Di vê dadgehê de netewyeke ku welatê wî bi destê Ewrûpa û dewletîn herêmê hatîye parçekirin, tê darizandin. Gelê kurd bi dehan caran serê xwe ji bo mafen xwe yên mirovahîye rakirîye û bi dehan caran bi hevkariya Ewrûpiyan û dewletîn herêmê hatîye qirkirin. Yê ku iro di wê dadgehê de were darizandin, ifrage û şansê wê netewye ku ji binê betonê serê xwe hildaye ye. Yê ku didarizine ji mixabin qatîlê serê netewye kurd e. Di vê dadgehê de ji yên ku di qirkirina kurdan de xwedî berpirsiyari ne, li nik dewleta tirk cih girtine. Mîna romana Gabrîel Marquez a bi navê "Duşema Sor", ev komploya ku li ser serê kurdan hate honandin, li ber çavên hemû cihanê û bi alîkariya deh

dewletan pêk hat. Ji ber vê taybetiyê di dîrokê de navê vê dadgehê dê bibe "Bêdadiya Sedsalê"

Encama wê ci dibe bila bibe, zarokên kesen ku rola wan di vê bêdadiyê de heye, dê li hemberî dîrok û mirovahîye sermixun bin. Ev bêdadiyeke wisa ye ku kes di vê dadgehê de nabêje: "Gelo kî ne yên ku li welatê kurdan dimînin li benda biharê, da ku kurdan di bihara wan de, li welatê wan bikujin. Gelo kî ne yên ku ji guh û memikên xamayê kurdan tizbiyan çedîkin? Gelo yên ku xanî, kadın, kavîl û koxên kurdan tevî mirov, pisik, kûçik, berx, karik, mirîşk, alav, qût, Qur'an û nivînan sotin kî bûn? Kî ne yên ku bi hezar kilometreyan ji dûr hatîn û xewnîn zarokan bi potînên xwe xera kîrin? Gund û bajarêne me bi taqîn kîjan welatan hatîn wîrankîrin? Donê gazê ji helikopter û firokeyen ku kîjan dewletê pêşkêş kiribûn, hatîbû reşandin bi ser zarokên Helepçeyê, Qulpê, Meletiyê, Çiyayê Bêzarê de? Leşkeren kîjan dewletê muxtarê gundê Derno ku li ser navçeya Hêneyâ Amedê ye ji helikopterê avêt? Gelo laşê wî muxtarî kîjan heywanetan xwar. Kê pîsi bi gundiyan da xwarin û li dadgeha Ewrûpa súcdar bû?"

Nehsed kuştiyê ku di goristana Nisêbînê de raketîne bi destê kê hatîne kuştin? Piraniya wan bi yek berikê hatîne kuştin. Ez piraniya wan nas dikim. Mirov dikare bibe kefilê wan ku piraniya wan hêj çav li silehê ji nekiribû. Hinek karker, hinek esnaf, xwen-

dekar, mamoste, û bê şixul bûn. Sûcê wan ew bû ku wan ji welatê xwe, ji zimanê xwe hez dikir. Qey dê û bavê wan nîn in. Qey xwiş, zarok û dergistiyen wan ji nîn in? Gelo ev dadgeh carek be ji dê li qatîlê wan ji bipirse?

Gelo ev dadgeh dê çeteyen ku bi xwîna kurdan tûrikên xwe tijî pere kirine bi bir bîne? Navê yên ku bi ambûlansan, bi erebeyen cenazeyan, bi helikopteran bazirganiya eroînê kirine û iro ji di meclisê de bixwîne. Nexêr ev dadgeh bersiva yek ji van pirsan nade. Lewre endamên dadgeh mîna memûran encex dikarin daxwaza amîrê xwe bi cih bînîn.

Ne raya giştî ya Tirkîyeyê ku fîmekorî û nexweş e dikare vê dadgehê binirxîne, ne ji çapemeniya tirk a ku bêhna kêzînê jê tê dikare vê dadgehê binirxîne. Ne germ li wan tê, ne sar li wan tê. Gava ku Öcalan dixwaze hinekî tansiyonê daxe, har dibin, dibêjin 'tîrsîya'. Dema ku dibêje 'ne ji ber tîrsî ye, ez dikarim nebaşiyê ji bikim', dibêjin, 'binêrin Öcalan zextan dike' û hwd.

Dixwazim du sê gotinan ji bo kes û rîexistinê bê wîjdan ên ku tu ked, xwîn û xwîdana wan di nav dozê de nîn e bibêjim: Ji roja roj de iş û karê we, kirina rexneyen ku ji bo xerakirinê ye. Di sala 1993'yan de ji dema ku PKK'ê agir rawestandibû, gelekan ji we digot: "An sileh û an sileh. Lî di jiyana xwe de tu kesi ji we ranehîştiye silehê û ranahêjîyê ji..."

Ş.Seîd kengî tevlî partiyê bû?

Rojekê dîlên şer ên di girtgehê de di perwerdehiyê de ne. Mijara perwerdehiya wan a wê rojê Serhildana Şêx Seîd e. Perwerdekar dibêje: "Şêx Seîd wiha kir, wiha lê da û wiha hate daleqandin" û hwd. Di wê navberê de ji nav wan hevalan yekî gundi ji nişka ve tiliya xwe bilind dike û wiha dibêje:

"Heval Şêx Seîd kengî tevlî partiyê bû!"

Zer... Zer... Zer ji xwe zer e

Rojekê gelê Hezexâ Şîrnexê ji bo pîrozbaşıya Newrozê li qada navçeyê di cive. Xortek ku ala ERNK'ê di dest de ye ji nava gel derdikeye ser xêni ku rengê alê bi gel bide nasin. Dengê xwe bilind dike û dibêje: "Binêrin, ev ala me ye. Wekî hûn jî dibînin ala me kesk, sor û zer e. Keskahiya alê, deşt û çiyayê me; sorahiya alê, ji xwîna me ye; zerahiya alê... zer... zer... zer jî ji xwe zer e lo!..."

Dibistana Seretayî

Li gundê Hezexê gava ku xwendegeha seretayî nû vedibe, gelek zarokên gund dest bi çûyîna dibistanê dikin. Zarok diçin xwendegehê lê tiştekî fêm na-



kin. Mamoste bi tirkî diaxive, zarok bi kurdî. Dê çawa bibe. Kes ji kesî tiştekî fêm nake.

Dîsa rojekê mamoste ji zarokan re dibêje: "yarın hepiniz tertemiz okula geleceksiniz (hûnê sibê giş pîr û pak werin dibistanê)".

Keçikek di ber xwe de dibêje: "Wîî, yadê ev qet fedî nake. Emê çawa bi terstan de mîz bikin. Bi Xwedê min bi terstan de mîz nekir."

BERHEVKAR: EMER VESEK

Hûn ne bergîr bûna...

Di hilbijartina 1999'an de li gundekî Mêrdinê yek bi kamyonê etariyê dike. Di gera gundan de, li gundekî disekine û li gora amblemên partiyan ji gundiyeke dipirse û dibêje: "Hûn di vê hilbijartinê de ci ne?"

Gundi dibêje: "Em di vê hilbijartinê de hesp in."

Etar bersivê dide: "Amentû billah hûn eyñî dişîbin jî."

Gundi ji etêr hêrs dibe, etar dîsa bersivê dide: "Kuro ma hûn ne bergîr bûna we dengê xwe ne dida bergîr!"

Bîst heb kutilk

Rojekê zilamek dizewice, ji ber ku mala wan li derveyî gundi e, ji xwe re bîst heb kutilkan çedike. Zilamek rîwî digihêje ber malê û li derî dixe û dibêje: "Ez mîvanê Xwedê me, hûn min dihewîmin?"

Zilam dibêje: "kerembike."

Rêwî diçe hundur û xwedî mal bîst heb kutilkên ku çêkiribûn gişan tîne, dide ber. Rêwî wan kutilkan gişan dixwe. Xwedî mal û jîna wî birçî dimînîn.

Dotira rojê dîsa ji xwe re kutilkan çedikin. Ber bi êvarî rîwiyeke li derî dixe û dibêje: "Ez mîvanê Xwedê, hûn mîvanan dihewînin?"

- Tu ji kîjan gundi yî?

- Ez ji gundê Kundê me.

- Heval ma gundiye we Selîmo hat mala me, me bîst heb kutilk çêkiribûn; me dan ber wî, ew kutilk giş xwar û em birçî hişt in.

- Ma malava kê ji te re got bîst heb kutilk bide ber. Te hivdeh, hijdeh an nozdeh heb bidana ber!

PÎRANÊ MÛDÎ

BI XELAT...

XACEPIRSA BI XELAT (175)

XACEPIRSA

Turca	Congresi	Qatalan	Armen	Georgian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian	Swedish	Polish	Hungarian	Georgian	Armenian	Ukrainian	Turkish	Chinese	French	Spanish	Portuguese	Azerbaijan	Arabic	Malay	Indonesian</

MEM KAYA



IMRALÎ RA XEBER ESTA

Öcalanî demokrasiya bêkemî wast

MEMED DREWS

(e.mail:mehmet@welat.com)

D oza Sesere 31'ê menga gulana 1999 de Girawê ûmralî de vira-ziyê. Ze ke ma verî jî nûst, mehkemaya seser ra hetanî peynî, bêmaben dewam bikiro. Wexto ke no niwis nûsyayê rojê çeharinê Doza Se-sere bi.

Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalan badê 104 rojan qefesê caminî miyan û ekranê televîzyonî ra bo jî ma dî.

Öcalanî rojê verînê mehkema de stratejiyê parastina xo kerd eşkera û vat ke hewna ûmkanê piyamendin esto û peyra jî qandê çareserkerdina meseleya kurd bi raya demokrasî û demokratbi-yînê dewlet firsend wast.

Öcalanî stratejiya parastina xo "Jûwîna Demokratik" ser ro viraşt. Xora Öcalanî xo jî, verî dabi zanayin ke oyo parastina xo çorşmeyê çareserkerdina demokratik de virazo. Heta Öcalanî parastinê xo jî, zey "Manifestoyê Jûwîna Demokratik" ebi name kerdibî.

Öcalan badê deyira rojê mehkema Manifestoyê Jûwîna Demokratik ser ro vindart û vînayinê xo ardî ziwan. Öcalanî bi kilmî vat ke hewna ûmkanê piyamendin esto, eke firsend bidiyo, ci dest ra çiçî bêro oyo bikiro. Feqet súcan ey ser çekerdina, qe teva çareser nêbeno. Heme çî alozyeno. O çax, zerarê ci jî şarê kurd û tirk vîneno. Coka lazim o ke serdarê dewlet qandê meseleya kurd raya demokrasî û aştiya çareserkerdin gam çekirê. Ancî Öcalanî parastina xo de vat ke, manaya parastina ci ya hiqû-

qi çinyo, çike oyo hetê hiqûqî ser ro mevindiro.

Öcalan parastina xo de giranî dayo tekiliyanê şarê kurd û tirk. Heta Öcalan Asya ra Mezopotamya ravêrdinê şarê tirk û tekiliyê ke o çax mabenê şarê kurd û tirk de estîbî ardê vîrî. Nîna piya jî ronayinê dewleta tirk a ewroyin de rolê kurdan ser ro jî vindarto û dayo zanayin ke Mustafa Kemalî qandê ronayina dewlet, kurdan ra hetkarîn wasto û ronayina dewleta ewroyin de hetkarînê kurdan giro. Feqet badê ronayin dewlet estina kurdan ûnkar kredo. Öcalanî qiseyê xo wina dewam kerdê: "Yanê nika şima nînan hemin çekirê jû kişt û sebebê heme çî min bivînê, teva kesî dest nekewno. Ewro qandê nê meseleyan firsend kewto ma dest. Lazim o ke ma nê firsendî winî rind bixeftinim û rojewê seranê di hezarana de ûnkar dinê şarê kurd çinêbo û dewlet jî wa bibo wayirê demokrasiya bêkemî. Raya gird biyayne dewlet na ra ya. Eke dewlet na ray ra şiro û demokrasiya bêkemiya bikewo seranê di hezarana, ezo winî taxmîn kena ke aya bibo dewleta gird a Rojhîlât Miyanî û Kafkasya. Feqet eke dewlet na ray meweçîno û zewbî ray weçîno a raya mabenê şarê kurd û tirk akiro û bibo sebebê dişme-nîna hezar seran".

Nê vatenê Öcalanî yê parastina esasî niyê. Parastina esasiya hetê peynîa mehkemaya biviraziyo. Feqet nê vatenê Öcalanî yê stratejiye parastin kenê eşkera. Öcalano qandê rindîna meşteşarê kurd û tirk jû ray mûsneno serdaranê dewlet û şare tirk. Öcalano vano: "15 serî yo şero lîmino dewam keno,

peynîa ne şerê lîminî de hezarana mardimî merdî. Bêrê ma nê şerê vindarnimi û wa kes memiro. Şarê kurd jî wa bibo wayirê haqanê xo." Hem vatenê Öcalani ra oyo winî ayseno ke, oyo winî vêsi teva ji nîwazeno. Ancî ne vatenê Öcalani newey jî niyê. Heveyê nûsenê ke, Öcalan ardiya Tîrkiye coka oyo nînan ano ziwan. Nê vateni zûr ê. Biyarê xo vîrî wexto ke Öcalan newe şibi İtalya jew eşkerakerdina wastenê xo û çend şertî ardîbî ziwan. Iyê ke sebebê vatenanê ewroy, tepişyayinê Öcalanî vînenê, wa bewnê wastenan, vatenan û niwisanê Öcalanî bes o. Yan jî şertî ke Öcalanî İtalya de kerdî eşkera wa bewnê û wa zûranê xo bivînê.

Ancî Öcalanî doza sesere de pêdiyîne ke dewlet hetanî nika PKK ya viraşte kerdî eşkera. Öcalanî vat ke, heta-nî nika çend finî dewlet ûnana pêdiyîn viraşto adirbirnayinê ke hetanî nika ey ûlan kerdî jî wastena dewlet ser kerdê. Dewlet 1993 ra na kişt çend finî raya mabendarana pêdiyîn viraşto. Finê jî jew albay Ewropa de endamê PKK ya pêdiyîn viraşto. Nê vatenanê Öcalanî ser, wezîrê karê parastinê verîye dewlet İsmet Sezginî vatenê Öcalanî kerdî rast feqet vat ke, pêdiyîn qandê destfistena îstixbaratan virazyayê.

Öcalanî zey taxmînî xeylê kesan mehkema açarnê platforma siyasi. Öcalanî strateji kerd eşkera, nika her keşo vatenanê Öcalanî ser ro qisey keno. Heta goreyê vatenan, serdarê dewletê raya jew sistemê kameraya taybeta nezdî ra teqîp kenê. Hemû rojnameyê dînyayê ca danê vatenanê Öcalanî û meselâya kurd.

Kilm Kilm

ÇİMÊ DINYAY
ÛMRALÎ DE BI

Rojê mehkema çimê dînyay Öcalanî rû vatenanê ci sero bi. Mûxabîranê rojname û televîzyonan Mudanya kerdi bî pir. Tabî ma stratejiyê parastina Öcalanî cér cor zanayê. Zanayinê ke resyê ma dest jî na rîpel de vejiyayê. Yanê şarê kurd nezdî ra stratejiya parastina Öcalanî zanayê. Béguman şarê kurd ancî vatenê Öcalanî meraq kerdê, feqet şarê kurd vatenana piya ganê (fizik) Öcalanî meraq kerdê. Ci ke çend finî abûkatan vatibi Öcalan sahiyyayo (biyo zayıf). Coka vatenan ra vêsi fizikê Öcalanî ser ro vindartê. Vaten ke ca de bo, şarê kurd çehar çîmanâ Öcalan pawitê. Wexto ke ekranê televîzyonê tîrkan ra û qefesê caminî miyan de Öcalan vînya kîfweşîn û hêrs piya kewtê û zere û mîzgê şarê kurd. Kîfweşîn amê ci çîman ver, çike vaj-yabi ke Öcalan sahiyyayo. Sahiyyâna Öcalanî néaysa yê. Heta zey verî aysayê. Coka kîfweşî bî. Hezarana kurdî hêrs bîbî. Ci ke dewletanê împerialis-tan destê serokê ci girêdayîbî û çekerdî qefesê caminî miyan. Coka he-zaran, a seat siwendê (sond) heyfigiro-tin wend

ABÜKATANÊ
ÖCALANÎ RÊ
VARDAYÎN VIRAZIYA

Rojê hîrîyinê mehkemaya sesere de Rabûkatanê Öcalanî rê hetê 60-70 faşistana vardayîn viraziya. Goreyê vatenâ abûkatanê Öcalanî ra Ahmet Avşarî, ê vardayîno girdî ra rew qedyayinê mehkemâ ser, bitesadûfi xelsiyayê. Eke mehkemâ zey rojanê bînan biqediyayê û eke herey biresayê Otel vardayîno girdayê viraziya. Abûkat Avşarî da zanayin ke Otel ke (Ömür Otel) abûkatî tede mendê faşistan rojê hîrîyin wayirê ci tehdît kredo. Coka wayirê Ömür Otelî ê nîviradayê zere. Faşistan o roj goreyê seat hewt ïnan rî faq ronaya, eke abûkatî seat hewt de birasayê ïnan dayê rastê faqa faşistan biyamayê. Abûkat Avşarî vat ke, Walîyê Bursa Orhan Taşanlarî xeber rîsta wayiranê Otelan û wasto ke kes ca medo abûkatan. Çend pêdiyînan peyra Otelê Ömür de ca diyayo ïnan. Feqet wişa jî polisan çorşmeyê Otelî girotê û nîviradayo ke kesîya pêdiyîn virazî. Avşarî wast ke dewlet verê nê vardayînan û faqan bigiro. Eke vardayînî wina dewam bikirê, abûkatî neşenê parastina xo hedre bikirê. Abûkatan qandê nê meseleyan çareserkerdin û ci rî ca peydakerdin rojê çeharin nîkewtî mehkemâ. Nîkewtina abûkatan ser serokê mehkemâ da zanayin ke dewlet qandê abûkatan û miryanañê Öcalanî mendin ca peyda kredo.

Seroka Belediyeya Qoserê Cihan Sincar.

Kesê di ber belediyeyê re boriye bûye karker!

Birêz Sîncar, di hilbijartina dawîn de, tevî gelek pest û kotekeyan ku rê ji mîfingên we bi xwe jî re girtî bû, bi taybetî li herêmê serkeftineke mezin hate bidestxistin. Hûn vê yekê çawa şîrove dikin?

✓ Rast e! Tevî zor û zehmetiyan, tevî ku nehathiştin em mîfingan çêbikin û tevî ku gerîna erebeyên me li taxan û propagandaya bideng hatin astengkirin jî, serkeftineke wilo me bi dest xist. Bi tenê sê rojêñ dawîn erebeyên me li navçeyê geriyan. Lé wê gavê jî çawa ku mîting pêk hatibe, erebeyên me dihatin pêşwazîkirin. Min bi xwe afişen xwe jî nedabûn çêkîrin, ez li taxekê jî negeriyam. Lé dîsa jî gelê me bi iradeyeke xurt em hilbijartin. Di vê derê de serkeftinek hebe, ev ne serkeftina min û ya xebata min e. Ev serkeftina dehan salan e. Gelê me êdî ne wekî berê ye. Kî li mafê wî xwedî derdikeve, kî hay jê heye, baş dibîne û dinase.

Tiştê ku gel bixwaze, kes nikare jê re bibe asteng. Rojekê konvoya me berî ku bikeve nava navçeyê, hate sekinandin. Amirê polisên ji terorê berpirs, bi destê xwe afiş û wêneyên serokê me Murat Bozak û hevalên me yên din çirandin û avêtin erdê. Wî digotin: "Ji sedî sed hûn belediyeyê bistinîn jî em nahêlin ku hûn rûnin!". Me jî got: "Heger ji we were, texsîr nekin!"

Ez bawer im di nava belediyeyênu ku HADEP'ê bidest xistiye de, radeya herî bilind Qoserê girt. Anglo we % 69 dengen li Qoserê stand. Gel bi vê yekê xwest mesajeke çawa bide?

✓ Ev tê wateya ku xelqê Kızıltepe (Qoser) yê êdî dibêje: "Ezê heqê xwe bi destê xwe bistinim!" Her wiha Qoserîyan raya xwe daye xwe.

Cend roj berê ez li Amedê bûm. Serokê Belediyeya Suriçyê Cezayir Serin diyar dikir ku berê kî hatiye belediyeyê ji bo kar, kesî jê re negotiye "Na!" Mirov dikare bibêje heman tişt li Qoserê jî pêk hatine?

✓ Eynî ji bo vê derê jî wisa bû. Ji nexweşan bigire heta mele û ixtiyaran; kesen ku riya wan di ber belediyeyê re jî derbas nebûye, ketine kar. Sosret û ecêb e; bi tenê di besa fenê de 600 kes çawa ku dixebite dihate dîtin, lê kes ji wan nedihate kar û serê mehê jî wan hatiye meaşê xwe standiye. Karkerêñ me yên fermî, bi tenê 243 kes in; ên din hemî bi qaçaxî dixebeitin. Waye nîvisa walî ji me re hatiye, dibêje: "Divê tu wan kesan ji



Ji Nexweşan bigire heta mele û ixtiyaran, kesen ku riya wan di ber belediyeyê re jî derbas nebûye, hilgirtine kar. Ecêb e; bi tenê di besa fenê de 600 kes çawa ku dixebite dihate dîtin, lê kes ji wan nedihate kar û serê mehê jî hatine meaşê xwe standine.

kar bavêjî, heger tu navêjî wê gavê Wezareta Karê Hundirîn dikare derheqê te de dozê veke û te ji kar bavêjî!"

Serokbelediyeyê berê, ew kes ji kar neavêtin lê em HADEP in. Heger em ji bo gelê xwe bixebitin, pêwîst e ku em li gorî zagonan tevbigerin. Ez bawer im di tiştîn wilo de çavêñ xwe ji me re nagirin.

Deynê me jî nêzîkî şes trîyonî ye. Bi tenê deynê karkeran 1,5 trîyon e. Pereyen ku ji bo me, ji "İller Bankası" yê tê, ji ber deynê me, tên birîn. Vê mehê ji me re 60 milyar pereyên tirk şand. Dibe ku vê alikariyê ji binî ve bibirin. Pênc milyar hatina nav bajêr, ji me re hatiye. Lé hatina bajêr ne ev tenê ye. Bi salan e ku belediye wekî malê çend malbat û akeyan hatiye dîtin. Ji ber van deynan zarokeki ku iro çavê xwe ji dinê re veke, heta deh saliya xwe wê deyndar be. Heqê kesî ji bo vê yekê tune ye.

Me li navçeyê bi cend kesan re xeberda. Wan got: "Bajar hatiye paqîjîkirin, pirsgirêka avê jî hinekî çareser bûye". Ligel şîroveya we ya li ser van dîtinan, dixwazim bipirsim hûnê bi ci awayî van deynen xwe safî bikin (biqedînîn)?

✓ Problema deynan, problemeke mezin e. Faîza wan bi xwe jî pir zêde ye.



Em dê hêdî hêdî li hev rûnin. Heger tiştîn me yên firotinê hebin, emê bifiroşin û faîzen deynê xwe bidin. Gelek xebatkar mexdûr bûne, çend ji wan hene ku teqawût bûne lê hê jî heqê xwe negirtine. Çend qul hebûn ku ji aliyan deynan ve me dagirt. Çend cih hebûn me dane sekinandin. Cihen din jî li gorî teqsîdan emê hêdî hêdî bidin.

Birayê min Şerefjan Cizîrî di hilbijartinan de li vê derê bû. Wî 14 salan li Swêdê serokatiya belediyeyan kiriye. Ew dê problema me bibe derve. Dibe ku alfakariyek ji wê derê ji bo me bê.

Projeya we ya yekemîn ci ye ku hûn bikin?

✓ Projeya avê ye. Rast e! Hinekîbehna xelqê vebûye, lê dema av tunebe jiyan disekine. Her ku diçe, Qoser mezin dibe, divê mirov li gorî vê mezînbûnê tevbigere û xwe li gorî pêşerojê saz bike. Divê em avê ji pişa Qoserê bînin. Pişti çareseriya pirsgirêka avê, êdî emê hewl bidin xwe ku Qoserê xweşiktir bikin.

Di warê çand û hûnerê de projeyen we hene?

✓ Belê projeyen me yên wilô jî hene. Bila ev problemen ku divê di zûtirin

katê de bêne çareserkirin xilas bibin, emê wê gavê dest bi projeyen çand û hunerî bikin. Niha pirtfûkxaneyeke me li navçeyê heye, lê mixabin têrê nakek. Emê wê xurtir bikin. Lé wekî min berê jî got, heta pirsgirêka avê, pirsgirêka re û kanalîzasyonê çareser nebe, tu nikarî bi karê çandî re jî eleqedar bibî.

Naybera we û qeymegam çawa ye. Berê gotibû: "Ezê çawa bi terorîstan re bixebitîm" Niha hûn li gorî wî "terorîst" in.

✓ Nîha tiştîk heye. Ez li ser navê HADEP'ê bûme seroka Belediyeyê lê ji bo min di navbera kesen li Qoserê de tu ferq tune ye. Ez hatime hilbijartin ku xizmeta mirovahiyê bikim. Kî ji bo xizmetê gavekê ber bi min ve biavêjê, ezê deh gavan ber bi wî ve bavêjim. Kesen ku bi vî mîjî, ku te bi nav kir difikirin ji em dê bi xizmeta xwe wan fedîkar derxin.

Niha dema em li nava bajêr geriyan, em diçûne ku derê, bi zimanê kurdî di hate axaftin. Ji banqeyan bigire heta daîreyen fermî. Anglo Qoser li cem min wekî navenda Welêt hate dîtin. Gelo mirov dikare bibêje ku ji ber vê rastîye % 69 deng hate girtin.

✓ Belê rola vê yekê heye. Lé tiştîk wisa jî heye: Li vê derê ereb jî hene û wan jî got "HADEP û Cîhan hev û din temam dike" û dengê xwe dan me.

Dema we dest bi kar kir we got: "Wê belediyeyê HADEP'ê bibin belediyeyen gel" û we diyar kiribû ku hûnê xebatén xwe bi awayekî zelal raxin ber çavê gel û komîsyonên gel ava bikin. Ji bo vê yekê hûnê ci bibêjin?

✓ Niha em pir nû ne. Lé di vê belediyeyê de ci dibe, divê em gel jê haydar bikin. Tiştê ku ew jê hez nakin, ez qet nakim, lê gelê me pir hişyar û zana bûye. Zane di kîjan demê de, çawa tevbigere. Wekî mînak; di Cejna 23'ye Avrêlê angó di Cejna Zarokan de, ji bo protokolê em hatîbûn vexwendin. Gelê me wê rojê em bi şiklekî wilo hembêz kîrin ku ez nikarîm bînim zîmîn. Dikaribû li wê derê tiştîk din jî bikira. Lé ci kir? Got: "Tu herî ku derê em bi te re ne!" Heta ji me were em jî dê layiqê wan bibin?